*e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi/Journal of Oriental Scientific Research (JOSR)*

*ISSN:1308-9633*

*Aralık-2020 Cilt:12 Sayı:4 (29) / December-2020 Volume:12 Issue:4 (29) Sayfa:1506-1534*

# *GULZAR*A ŞÊX TAHIRÊ ŞOŞÎ: MESNEWÎYEKE XWESER A EDEBÎYATA KURDÎ YA KLASÎK Û TAYBETÎYÊN WÊ YÊN AVAHÎYA DEREKÎ

**Abdurrahman ADAK***

**Kurte**:

*Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî (k.d. 1962) mesnewîyeke dînî/tarîxî ya edebîyata Kurdî ye ku di sedsala XXem de hatîye nivîsîn. Dema em mesnewîyên hemû dîyalektên edebîyata Kurdî li ber çavan digirin, em dibînin ku vê kêlîyê *Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî teqrîbî bi 14.000 beytan ji alîyê qewareyê ve di pileya herî bilind de ye. Mixabin ji ber ku nivîskarê wê di temenekî ciwan de çûye rehmetê beşa xatîmeyê jî di nav de qismek ji Gulzarê nehatîye nivîsîn. Hem dîbace hem jî beşa sereke ya mesnewîyê bi taybetî ji alîyê cureyên edebî ve gelekî dewlemend in. Bi qasî ku tê dîtin, dîbaceya *Gulzar*ê digel *Mem û Zîn*a Xanî û *Rewdu'n-Ne'îm*a Rûhî yek ji sê dîbaceyên herî girîng a edebîyata Kurmancî ye. Di gotarê de pêşî li ser mesnewînûsîya Kurdî, Şêx Tahirê Şoşî û *Gulzar*a wî zanyarîyên giştî hatine dayîn. Piştre bi hûrgulî hêmanên avahîya derekî yên *Gulzar*ê (qeware, kêş, tertîb û sernav) bi rêbazeke zanistî û bi awayekî berfireh hatine pêşkêşkirin, berawirdîya wan bi standarta mesnewîyên Farisî re hatîye kirin û bi vî awayî xweserîyên *Gulzar*ê hatine tesbîtkirin.

**Peyvên Sereke:** Şêx Tahirê Şoşî, *Gulzar*, mesnewî, avahîya derekî.

## GULZAR OF SHEIKH TAHIRÊ SHOSHÎ: AN ORIGINAL MASNAWÎ OF CLASSICAL KURDISH LITERATURE AND ITS FEATURES OF THE EXTERNAL STRUCTURE

**Abstract**

*Gulzar* of Sheikh Tahirê Shoshî (d. 1962) is a religious/historical masnawî of Kurdish literature written in the 20th century. When it comes to the masnawîs of all dialects of Kurdish literature, we see that *Gulzar* of Sheikh Tahirê Shoshî is the largest one with a volume of approximately 14,000 verses. Unfortunately, as the author passed away at a young age, a section of the book was not written, including part of "xatîme" . Both the preface and the main part of the masnawî are very rich especially in terms of the literary genres. As can be seen, *Gulzar*'s introduction along with Xanî's *Mem û Zîn* and Rûhî's *Rewdu'n-Ne'îm* is one of the three most important introductions of Kurmanji literature. The article first focuses on Kurdish masnawîs, Sheikh Tahirê Shoshî and his *Gulzar* in general. Then the details of the external structure of *Gulzar* (size, shape, order and title)

Article Types / Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 09.12.2020, Accepted / Kabul Tarihi: 29.12.2020
Doi: https://doi.org/10.26791/sarkiat.838121

* Mardin Artuklu Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü, abdurrahmanadak@gmail.com
ORCID ID: https://orcid.org/0000-0002-9124-1605

are presented in a scientific and comprehensive way, their comparison with the standard of Persian masnawîs and thus the autonomy of *Gulzar* is determined.

**Keywords**: Sheikh Tahirê Shoshî, Gulzar, masnawî, external structure.

## DESTPÊK

Mesnewî, wek têgeheke edebîyata klasîk a Îslamî, teşeyeke nezmê ye ku yekeya wê beyt e, misrayên beytên wê di nav xwe de hemserwa ne û hemû beytên wê bi heman qalibê erûzê hatine nivîsîn. Ev teşeya nezmê zêdetir di berhemên serbixwe de hatiye bikaranîn û hemû berhemên ku bi vê teşeyê hatine nivîsîn bi awayekî kollektîf wek "mesnewî" hatine binavkirin. Di edebîyata klasîk a Îslamî de mesnewîyê rola pexşanê lîstîye û mijarên tehkîyeyî (çîrokî) di vê formê de xwe dane der. Loma qewareya mesnewîyê, tertîba wê (dabeşkirina beşên wê) û mijarên dîbace û xatîmeyê di serî de bi giştî avahîya derekî ya mesnewîyê di bin bandora berhemên pexşan de ye. Bêguman ev alîyê mesnewîyê ye ku di teorîya edebîyata klasîk a Îslamî de wê ji helbestên dîwanan cuda dike û wek qadeke serbixwe ya edebîyata klasîk destnîşan dike. Bi vê taybetîya xwe mesnewî bûye zemîna herî guncaw a serdema klasîk ku helbestvanan ji bo mijarên dirêj ên dastanî, dînî, tarîxî û hwd. serî lê dane.

Li gor zanyarîyên li ber destan di tarîxa edebîyata Kurdî ya klasîk de mesnewîya yekem *Perîşannamey*a Mela Perîşanê Dînewerî (k.d. 1420) ye ku di sedsala XIV/XVem de hatîye nivîsîn. Ji wê sedsalê heta bi roja me jî nivîsîna mesnewîyan di edebîyata Kurdî ya klasîk de hebûna xwe domandîye. Bi awayekî siruştî hin ji van mesnewîyan bi hin taybetîyên xwe yên xweser ji yên dî zêdetir derdikevin pêş ku ev jî di xalên wek naverok, cure, şêwaz û avahîya derekî de xwe dide der. Mesnewîya Şêx Tahirê Şoşî (k.d. 1962) ya bi navê *Gulzar*ê jî bi taybetîyên xwe yên di biwara avahîya derekî de wek mesnewîyeke girîng û xweser a edebîyata Kurdî balê dikişîne ser xwe. Lêbelê eger em çend xebatên Tehsîn Î. Doskî[1] û çapa berhemê ya Hemze Tahir Şoşîyê kurê Şêx Tahirê Şoşî digel muqeddîmeya ku jê re nivîsîye[2] nehesibînin ev mesnewîya girîng heta niha nebûye mijara vekolînên zanistî û li nav Kurdên Bakur tam nehatîye naskirin. Armanca vê gotarê ew e ku taybetîyên *Gulzar*a Şoşî yên avahîya derekî bên tesbîtkirin, berawirdîya wê bi standarta mesnewîyên Farisî re bê kirin û wek mesnewîyeke xweser cihê wê di nav mesnewîyên Kurdî de bê destnîşankirin. Em bawer dikin ku bi vî awayî mijareke girîng a qada mesnewînûsîya Kurdî dê bê ronkirin.

Di gotarê de bi mebesta ku paşxana mijarê bê fêmkirin pêşî li ser mahîyet û dîrokçeya mesnewînûsîyê; bîyografî, berhemdarî û hunermendîya Şêx Tahirê Şoşî û mesnewîya *Gulzar*ê zanyarîyên pêdivî û giştî dê bên pêşkêşkirin. Piştre di beşa esasî ya gotarê de avahîya derekî ya *Gulzar*ê bi awayekî berfireh û berawirdî dê bê analîzkirin û xweserîyên wê di nav mesnewîyên Kurdî de dê bên destnîşankirin. Bi beşên encam û çavkanîyan jî dê dawî li gotarê bê dayîn.

---

[1] Tehsîn Îbrahîm Doskî, *el-Medxel li Diraseti'l-Edebi'l-Kurdî*, *Cem'iyetu Ulemaî Kurdistan*, Dihok 1993, r. 94-95; "Şex Tahire Şoşî û Gulzara Wî", *Kovara Nûbiharê*,sal: 2010, hejmar: 112; Hemdî 'Ebdulmecîd Selefî & Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Iqdu'l-Ciman fî Teracimî 'Ulema we Udeba el-Kurd we'l-Mensûbîne îla Qura we Mudun Kurdistan*, Mektebetu'l-Esaletî we't-Turas, sal: 2008, berg: 3, r. 1167-1168; Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Eş-Şeyx Tahir eş-Şûşî: Muheqqîqen li Dîwan eş-Şeyx el-Cezerî*, Kovara Metîn, sal: 2000, r. 140-145.

[2] Hemze Tahir Şoşî, "Jîyanname Şêx Tahirê Şoşî", *Gulzar Şêx Tahirê Şoşî*, ber. Hemze Tahir Şoşî, Êkîtîya Nivîserên Kurd, Dihok 2012. (muqeddîme: r. 18-50).

## 1. MESNEWÎ Û MESNEWÎNÛSÎ

Peyva mesnewîyê di zimanê Erebî de bi rêya nisbetê ji cotepeyva “mesna mesna”yê hatîye darîştin ku wateya wê “didu didu”, yan jî “cot cot” e. Ji ber ku di teşeya mesnewîyê de du misrayên her beytekê di nav xwe de hemserwa ne, bi gotineke dî ji ber ku serwaya beytên wê cot e, di edebîyata Farisî de ji vê teşeyê re “mesnewî” hatîye gotin. Ji alîyê termînolojîya edebîyata klasîk ve mesnewî; teşeyeke nezmê ye ku yekeya wê beyt e, misrayên beyten wê di nav xwe de hemserwa ne û hemû beytên wê bi heman qalibê erûzê hatine nivîsîn. Berevajî teşeyên dî yên nezmê, mesnewî ne di nav dîwanan de zêdetir di berhemên serbixwe de hatîye bikaranîn. Di edebîyata Îranê de hemû berhemên ku bi vê teşeyê hatine nivîsîn bi awayekî kollektîf wek “mesnewî” hatine binavkirin. Recez/urcûzeyên ku di serdema cahilîyeyê ya edebîyata Erebî (sedsal: VI) de hatine bikaranîn, ji alîyê pisporan ve wek forma herî kevin a mesnewîyê tên qebûlkirin. Piştî vê qonaxê di destpêka sedsala VIIIem de bi zêdebûna qewareya urcûzeyan teşeya muzdewiceyê derketîye meydanê ku hem ji alîyê sîstema serwayê ve hem jî ji alîyê qewareyê ve beramberî mesnewîya edebîyata Farisî tê.[3]

Heçî mesnewîyên edebî ne, ew cara pêşî di edebîyata Farisî de hatine dayîn û mesnewîyên pêşî yên vê edebîyatê di destpêka sedsala XIem de hatine nivîsîn.[4] Eger em behsa mesnewînûsên girîng ên edebîyata Farisî bikin, bêguman di serê wan de divê navê Firdewsî (k.d. 1020) bê zikirkirin. Ferîduddînê ‘Ettar (k.d.1221), Mewlana Celaleddînê Rûmî (k.d. 1273) Se’dîyê Şîrazî (k.d. 1291), Nîzamîyê Gencewî (k.d. 1211) û Camî (k.d. 1492) jî mesnewînûsên girîng ên edebîyata Farisî ne.[5] Tu guman tuneye ku mesnewînûsîya Farisî bi van nûneran pileyeke gelekî baş bi dest xistîye û bandor li edebîyatên dî yên Îslamî jî kiriye.

Di çarçoveya zanyarîyên heyî de mesnewîya yekem a edebîyata Kurdî *Perîşanname*ya Mela Perîşanê Dînewerî (k.d. 1421) ye ku di sedsala XIV/XVem de bi Kurdîya Goranî hatîye nivîsîn. Piştî Dînewerî di edebîyata Goranî de gelek helbestvanên mesnewînûs derketine ku di nav wan de bi taybetî Xanay Qubadî (k.d. 1754) balê dikişîne. Herweha di edebîyata Goranî de di çarçoveya şehnameya Kurdî de teqrîbî 30 mesnewîyên epîk û tarîxî yên wek *Îran û Tûran* û *Heft Leşker* jî hatine nivîsîn.

Li gor agahîyên berdest, di dawîya sedsala XVIIem de, kesê ku teşeya mesnewîyê xistîye nav Kurdîya Kurmancî Ehmedê Xanî (k.d. 1707) ye. Xanî, pêşî mesnewîyeke dînî-dîdaktîk (*Eqîdeya Îmanê*), piştre jî mesnewîyeke dastanî-evînî (*Mem û Zîn*) nivîsîye û ji bo edebîyata Kurmancî di warê mesnewîyê de gaveke girîng avêtîye. Mesnewîyên dastanî/evînî ku bingeha wê di edebîyata Farisî de ji alîyê Nîzamî ve hatibû danîn û ji alîyê Camî ve gihîştibû lutkeyê, cara pêşî bi *Mem û Zîn*ê Xanî ketîye nav edebîyata Kurdî. Piştî Xanî; di sedsalên XVIII û XIXem de Selîmî bi *Yûsif û Zuleyxa*ya xwe, Sewadî bi *Leyla û Mecnûn*a xwe û Sîyahpoş bi *Seyfilmilûk*a xwe di qada mesnewînûsîya dastanî-lîrîk; Melayê Bateyî bi mewlûdnameya xwe di qada mesnewînûsîya dînî-lîrîk û Mela Xelîlê Sêrtî jî bi

[3] Mensûr Restgar Fesaî, *Enwa’ê Şi’rê Farisî*, Şîraz 1373, r. 428; Ezîz Gerdî, *Serwa*, Aras, Hewlêr 1999, r. 183; Nihad M. Çetin, *Eski Arap Şiiri*, çapa duyem, Kapı Yay. İst. 2011, r. 55-59; Baqir Qurbanî Zerîn, “Mesnewî: Qalibê Şi’rê Farisî ya Erebî?”, *Ayîneê Mîras*, sal. 9, j. 49, r. 183.
[4] Zerîn, g.n., r. 182.
[5] Ji bo agahîyên berfireh derheqê mesnewîyê de bnr. Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê*, Nûbihar, İst. 2019, r. 245-252.

*Nehcu'l-Enam* û tecwîdnameya xwe di qada mesnewînûsîya dînî-dîdaktîk de gavên girîng avêtine.

Di edebîyata Kurmancî ya serdema piştî mîrektîyan de, mesnewînûsîyê bi nûnerên nû hebûna xwe berdewam kirîye. Bi taybetî di dawîya sedsala XIXem û destpêka sedsala XXem de helbestvanên malbata Aqtepeyê mesnewîyên girîng nivîsîne. Ji vê malbatê Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî *Rewdu'n-Ne'îm;* Şêx Mihemed Can *Leyla û Mecnûn;* Şêx Eskerî jî *'Iqdê Durfam* nivîsîne. Di sedsala XXem de jî mesnewînûsîya Kurmancî ranewestîyaye. Mesnewîyên ku di vê qonaxê de hatine nivîsîn, qet nebe hin ji wan, ji alîyê qewareyê ve ji yên berî xwe mezintir in. Bi awayekî giştî Şêx Tahirê Şoşî (*Gulzar*) ku mijara gotara me ye, Mela Mihemed Nûrîyê Ewhedî (*Mersîyename Derheqê Îmam Huseyn, Nuzhetu'n-Nufûs fî'n-Nesaih* û *el-Menzûmetu'l-Mi'racîye*) û Mela Nûrullahê Godîşkî (*el-Hemail fi'ş-Şemail* û *el-Cewahiru'r-Reşadîye*) di vê kategorîyê de derdikevin pêş.

Di edebîyata Kurmancî ya vê qonaxê (sedsala XIXem) de menzûmeyên mewlûdê ku di qada mesnewîyên dînî-lîrîk de cih digire û menzûmeyên zanistên Îslamî (eqîdename, fiqihname, tecwîdname, menzûmeyên heşrê, menzûmeyên hedîsê, menzûmeyên sîyerê) ku dikevin qada mesnewîyên dînî-dîdaktîk gelekî pêş ketine û di van cureyan de gelek mesnewî hatine nivîsîn.

Di edebîyatên Soranî û Zazakî de mesnewînûsî zêde pêş neketiye. Şêx Me'rûfê Nodî (k.d. 1837) bi *Ferhenga Ehmedî* û Mela Ebdulkerîmê Muderis (k.d. 2005) bi *Durişte*yê wek mesnewînûsên girîng ê edebîyata Soranî; Melayê Xasî (k.d. 1951) û Osman Efendî Babij (k.d. 1929) jî bi mewlûdnameyan wek mesnewînûsên girîng ên edebîyata Zazakî dikarin bên jimartin.[6]

Çawa tê dîtin mesnewînûsîya Kurdî di mecrayên curbicur de bi dîyalektên cuda yên edebîyata Kurdî gihîştîye heta bi roja me. Bêguman bi vê paşxana xwe ya tarîxî mesnewînûsî yek ji qadên herî girîng a vekolînên edebîyata Kurdî ya klasîk e û mijara vekolîna me jî mesnewîya Şêx Tahirê Şoşî ya bi navê *Gulzar*ê ye.

## 2. ŞÊX TAHIRÊ ŞOŞÎ

### 2.1. Bîyografîya Wî

Şêx Tahirê Şoşîyê ku jîyana xwe di nîveka yekem a sedsala XXem de borandîye kurê [Şêx] Mihemed, ew jî kurê [Şêx] Tahir, ew jî kurê Şêx Îslamê Şoşî ye. Şoşê gundekî devera Behdînan e ku li Kurdistana Iraqê di navbera bajarên Dihok û Akrê de dimîne. Malbata Şêx Tahir di jîyana ilmî, dînî û tesewifî ya devera Behdînan de malbateke karîger e. Bapîrê wî yê mezin Şêx Şemsedîn hêj di sedsala XVIem de şêxekî navdar ê deverê bûye. Dema em tên nîveka yekem a sedsala XIXem em dibînin ku bapîrê wî Şêx Şêx Îslamê Şoşî jî intîsabî Şêx Nûredînê Birîfkanî (k.d. 1850?) kirîye û li Şoşê di tekyaya xwe de li pey rêça terîqetên Xelwetîtî û Qadirîtîyê çûye. Hêjayî gotinê ye ku helbestvanên edebîyata Kurdî ya klasîk Xerîbî û Seyfî (Ebdulletîfê Şoşî) jî navdarên dî yên vê malbatê ne.

Helbestvanê me Şêx Tahirê Şoşî di dawîya sala 1917an de di nav vê atmosfera ilmî, tesewifî û edebî de li Şoşê hatîye dinyayê. Pêşî li gundê xwe li ber destê bavê xwe Şêx Mihemed Qur'an xwendîye û li ber destê Şêx Memdûhê Şoşî jî pirtûkên destpêkê xwendine. Piştre bi mebesta ku zanîna xwe ji jêderên curbicur bi dest bixe li gelek deveran gerîyaye û di medreseyên curbicur de perwerde dîtîye. Di vê çarçoveyê de pêşî qesta medreseyên devera Behdînan kirîye û li Akrê li cem Mela

[6] Ji bo agahîyên berfireh derheqê mesnewînûsîya Kurdî de bnr. Adak, b.n., r. 252-257.

Mihemedê Akreyî, li Başqala Axay li cem Mela Pîrê Kadanî, li Celdyanê li cem Mela Şemsedînê Şoşî, li Mikêrsê li cem Mela Ehmedê Hostanî, li Bagêra li cem Mela Hisênê Marînisî (Marûnisî) û li Akrê li cem Mela Omerê Sîrçî û Miftî Efendî perwerde dîtîye. Şoşî piştre qesda devera Soran kirîye û li Hîranê li cem Mela Ebdulezîzê Kak Mustefa, li Korê û Batasê li cem Mela Tahayê Korê, li Bêlinge li cem Mela Ebdulmecîdê Hertelî, li Xaneqa Şêx Mezher li cem Mela Salihê Kozepankî, li Koye li cem Mela Me'sûmê Koyî û li Hewlêrê li cem Mela Ebdulayê Bêtwateyî perwerde dîtîye. Piştî ku li van medreseyan perwerdeya xwe xilas kirîye di sala 1947/1948an de li Hewlêrê li Mizgefta Hacî Ebdulqadirê Debbax ji destê Mela Ebdullahê Bêtwateyî îcazeta melatîyê wergirtîye.

Çawa tê dîtin Şoşî li ber destê gelek seydayan perwerde dîtîye. Lêbelê ji nav wan bi taybetî ketîye bin tesîra Mela Hisênê Marînisî (k.d. 2012) ku bi eslê xwe ji devera Hekarîyê ye. Herweha Şoşî ji Mela Mihemedê Akrê, Mela Hemzeyê Xanî û Mela Ebdulayê Bêtwateyî re jî gelek rêz girtîye. Digel ku Şoşî Bedîuzzeman Mela Se'îdê Nûrsî (k.d. 1960) rûbirû nedîtîye jî piştî ku di sala 1928/1929an de berhemên wî xwendine ew jî ji xwe re wek seydayekî qebûl kirîye û dema *Gulzar* nivîsîye di muqeddîmeyê de bi taybetî pesnê wî daye:

Ya reb tu min û xulamê Qur'an
Seydayê mezin melayê Kurdan

Seydayê heman Se'îdê meşhûr
Ustadê me cumle talibê nûr

Çil salî me ew pitir li heştê
Ya Reb me heman bibey biheştê[7]

Şoşî piştî îcazeta xwe vegerîyaye Behdînan û li gundê Sîsina ku dikeve rojavayê Akrê dest bi melatîyê û perwerdekirina feqîyan kiriye. Mixabin ji ber nexweşîya weremê ku lê peyda bûye vê qonaxa jîyana wî tenê 13-14 salan dom kirîye. Şoşî di dawîya sala 1961ê de li Bexdaya ku lê tedawî didît çûye ser dilovanîya Xwedê û li Şoşê li goristana Şêx Şemseddînî hatîye veşartin. Cihê teqdîrê ye ku Şoşî di vê maweya kurt de bi feqîyên ku perwerde kirine, berhemên ku nivîsîne û hunerên ku nîşan dane xizmeteke mezin ji zanist, huner û edebîyata Kurdî re kirîye.[8]

## 2.2. Berhemdarî û Hunermendîya Wî

Şêx Tahirê Şoşî zana, hunermend û edebîyatvanekî xwedî berhem ê serdema xwe ye. Di temenê xwe yê kurt de digel Kurdîya Kurmancî û Kurdîya Soranî fêrî zimanên Erebî, Farisî û Tirkî bûye û bi Kurdî, Erebî û Farisî helbest û menzûmeyên edebî nivîsîne. Guman tuneye ku di nav hemû berhemên wî de bi taybetî berhema wî ya edebî ya bi navê *Gulzar*ê derdikeve pêş ku mijara gotara me ye jî. Lêbelê wî ji bilî Kurdî bi Erebî jî tibabek berhem dane. Hin berhemên wî li ser zanista helbestê hatine nivîsîn û bi edebîyatê re pêwendîdar in, hin berhem

[7] Şêx Tahirê Şoşî, *Gulzar*, ber. Hemze Tahir Şoşî, Êkîtîya Nivîserên Kurd, Dihok 2012, r. 84.
[8] Ji bo zanyarîyên berfireh derheqê jîyana Şêx Tahirê Şoşî de bnr. Hemze Tahir Şoşî, "Jîyannama Şêx Tahirê Şoşî", r. 18-50.

bi tarîxê re, hin berhem jî bi zanistên Îslamî re pêwendîdar in ku ev berhemên wî li jêrê dê bên nasandin:[9]

1. **Rîyazê Nûr (*Gulzar*):** Ev berhem mijara gotara me ye. Ji ber ku zanyarîyên pêdivî yên derheqê vê berhemê de hem bi giştî hem jî bi hûrgulî dê bên pêşkêşkirin em li vê derê li ser ranawestin.

2. **Eş-Şerhu'l-Menzûm ‘ela Urcûzet eş-Şeyx Me‘rûf en-Nodehî:** Şoşî di vê berhemê de menzûmeya Şêx Me‘rûfê Nodehî ya ku bi zimanê Erebî li ser ilmê ‘eruzê nivîsîye dîsa bi zimanê Erebî û bi awayekî menzûm şerh kirîye. Berhema ku ji 535 beytan pêk tê destnivîs e û di pirtûkxaneya taybet a Hemze Şoşîyê kurê Şêx Tahirê Şoşî de tê parastin.

3. **Fennu'l-Qafîye:** Mijara vê berhemê hunera qafîyeyê ye ku hêmaneke bingehîn a rîtm û estetîka helbestê ye. Berhem bi zimanê Erebî û bi awayekî menzûm hatîye nivîsîn. Berhema ku ji 98 beytan pêk tê destnivîs e û di pirtûkxaneya taybet a Hemze Şoşî de tê parastin.

4. **el-Muntexeb fî Zikra Mîladî Muhemmed Fexru'l-‘Ecem we'l-‘Ereb:** Ev berhema Şoşî mewlûdnameyeke pexşan e û bi zimanê Erebî ye. Berhema ku ji 40 wereqî pêk tê di pirtûkxaneya taybet a Hemze Şoşî de tê parastin.

5. **Mûcez Tarîx Heyatî we Ma Şahedtuhu Mine'l-Hewadis el-Muhîmme:** Di vê berhema bi Erebî de nivîskar li ser kurtejîyana xwe û serborîyên xwe yên girîng radiweste. Berhem destnivîs e û di pirtûkxaneya taybet a Hemze Şoşî de tê parastin.

6. **Et-Tarîx - We Hazihî Nebzetun min Tarîx el-Hewadis we'l-Weqai’ we Wefat kîbari'r-Rîcalat:** Ev berhem ya bapîrê nivîskarê me Şêx Îslamê Şoşî ye û derheqê bûyerên tarîxî û wefata kesayetên girîng de ye. Şêx Tahir jî hin rûdanên nû li dawîya berhemê zêde kirine. Destnivîsa berhemê di pirtûkxaneya taybet a Hemze Şoşî de tê parastin.

7. **Tehqîqên Dîwana Melayê Cizîrî:** Şêx Tahirê Şoşî du caran dîwana Melayê Cizîrî bi xetê xwe istînsax û tehqîq kirîye. Yek ji van tehqîqan di rêya Qahîreyê de winda bûye, ya dî jî di şewata çapgeha “Kurdistan”ê ya Gîwê Mukrîyanî de şewitîye. Lêbelê xweşbextane Mela Tahayê Kovilî li ber yekê ji van nusxeyek ji bo xwe istînsax kirîye û ev nusxe di pirtûkxaneya taybet a Tehsîn Î. Doskî de tê parastin.[10]

8. **Tehqîqu Îşarati'l-Î‘caz fî Mezanni'l-Îcaz:** Şoşî di vê xebata xwe de berhema Mela Se‘îdê Nûrsî ya bi navê *Îşaratu'l-Î’caz fî Mezanni'l-Îcaz*ê ku bi zimanê Erebî ye istînsax û tehqîq kirîye. Îhsan Qasim Salihî ev xebata Şoşî li ser navê xwe çap kirîye.

---

[9] Şoşî, *Gulzar*, r. 35-39.
[10] Ji bo danasîna vê nusxeyê bnr. Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Eş-Şeyx Tahir eş-Şûşî: Muheqqîqen li Dîwan eş-Şeyx el-Cezerî*, Kovara Metîn, sal: 2000, r. 140-145.

9. **Min Hîkemîyat en-Nûrsî:** Ev xebata Şoşî ji metnên girîng ên ku ji berhemên Mela Se‘îdê Nûrsî hatine hilbijartin pêk tê. Xebat destnivîs e û di pirtûkxaneya taybet a Hemze Şoşî de tê parastin.
10. **Istînsaxên Curbicur:** Şoşî hem ji bo xwe hem jî ji bo hevalên xwe bi sedan berhem, name, xutbe û hwd. bi xetê xwe yê xweşik istînsax kirine.
11. **Resailu'n-Nûr:** Şoşî hemû berhemên Mela Se‘îdê Nûrsî yên bi navê “Resailu'n-Nûr”ê bi xetê xwe istînsax kirine.
12. **Texmîsên Helbestên Melayê Cizîrî**: Şoşî pênc helbestên Melayê Cizîrî texmîs kirine. Ev texmîsên wî di dawîya nusxeya dîwana Mela ya ku ji alîyê wî ve hatiye tehqîqkirin de cih digirin.

Taybetîyeke Şoşî ew e ku ne tenê bi dayîna dersan û nivîsîna berheman re mijûl bûye. Ew di heman demê de di hunerên curbicur de jî xwedî qabilîyet bûye ku di serê wan de hunera xettatî/xweşnivîsîyê tê. Wî di sala 1946an de berî ku îcazeta medreseyê bistîne bi du salan ji xettatê Kurd ê navdar Mihemed Tahirê Mekkî icazeta xetê standîye. Şoşî nimûneyên xetên xwe bi rêya posteyê şandine Mekkehê û pêşkêşî Mekkî kirine, piştî ku Mekkî nimûne nirxandine jê re îcazeta xetê amade kirîye û şandîye navnîşana wî. Şoşî Mesnewîya *Gulzar*ê ku mijara gotara me ye, berhemên Mela Se‘îdê Nûrsî, dîwana Melayê Cizîrî û gelek berhemên ku di medreseyan de hatine xwendin bi xetê xwe yê xweşik nesx kirine. Bi heman rengî di endazeya xetkêşanê, neqşên li ser wereqên destnivîsarîyê, cizûbendkirina bergên destnivîsaran û gelek biwarên dî de huner û me‘rîfetên wî hebûne. Hêjayî gotinê ye ku Şoşî di şeklê gulekê de helbesteke hendesî çê kirîye ku ew jî bi hunermendîya wî re eleqedar e û di helbesta Kurdî de nimûneyên wê kêm in.[11]

## 3. *GULZAR*A ŞOŞÎ BI AWAYEKÎ GIŞTÎ

*Gulzar*, mesnewîyeke dînî-tehkîyeyî ya Kurdîya Kurmancî ye ku teqrîbî ji çardeh hezar beytan pêk hatîye û derheqê sîret/bîyografîya cenabê Pêxember de hatîye nivîsîn. Di mesnewîyê de ne tenê bîyografîya kronolojîk a Cenabê Pêxember, gelek mijarên bi wî re pêwendîdar ên wek pêşîyên wî, malbata wî, hevalên wî, exlaq û şemaila wî jî cih digirin. Navê *Gulzar*ê yê esasî bi Erebî ye û li ser bergê berhemê jî (bnr. Pêvek 2) navê wê yê bi Erebî weha hatîye nivîsîn: *Rîyadu'n-Nûr el-Menzûme el-Kurdîyye fî Sîretî Seyyîdîna Muhemmed we Heyatihî eş-Şerîfe ez-Zekîyye* (Rîyadu'n-Nûr Menzûmeya Kurdî li ser Sîreta Mezinê Me Muhemmed û Heyata Wî ya Şerîf û Pak). Lêbelê divê bê gotin ku nivîskar di nav metnê mesnewîyê de bi Kurmancî jî du nav li berhema xwe kirine ku ew jî *Baxê Nûr* û *Gulzar* in. Hêjayî gotinê ye ku her du jî wergerên navê Erebî ne:

Ya Reb tu ‘elîm î tu dizanî
Mêj e keserek ku min di canî

Fikrek mi heye eger çî dûr e
Emma tu dizanî ***Baxê Nûr*** e[12]

[11] Şoşî, *Gulzar*, r. 39-40.
[12] Şoşî, h.b., r. 14.

* * *

Ger çî me li nik xeyalê dûr e

Lakin çemen û rêbazê nûr e

Serhatîyê wî Resûlê muxtar

Hem nûr û çira ye hem xo ***Gulzar***[13]

Şoşî, carinan jî navê mesnewîyê yê bi Erebî (Rîyadu'n-Nûr) xistîye nav qalibê rêzimana Kurmancî:

Ey nazirê ev **Rîyazê Nûr** e

Min ser te bira selamê zor e[14]

Di esasê xwe de navê mesnewîya Şoşî (Rîyadu'n-Nûr), ji alîyê forma rêzimanî, sec' û wateyê ve nezîreya navê berhemên Mela Se'îdê Nûrsî (Rîsaletu'n-Nûr) ye. Çawa ku li jorê di mijarên bîyografî û berhemên wî de jî derbas bû, Şoşî Nûrsî nedîtîye lêbelê ew ji xwe re wek seydayekî qebûl kirîye, girîngîyeke zêde bi berhemên wî nîşan daye û di muqeddîmeya mesnewîya xwe de ji bo Nûrsî medhîyeyek jî nivîsîye. Loma aşkera ye ku di navlêkirina bi şêweya "Rîyadu'n-Nûr"ê de jêdera Şoşî berhemên Nûrsî ne. Her di vê çarçoveyê de em dibînin ku Şoşî di beşa îthafê de jî mesnewîya xwe îthafî "telebeyên nûrê" (xwînerên berhemên Nûrsî) kirîye.[15]

Şoşî, berhema xwe bi van her du beytên jêrîn daye destpêkirin (bnr. Pêvek 3):

Ellah ku çi navekî şirîn e

Gotna wî heyatê can û jîn e

Ey navê te ye Rehîm û Rehman

Wey zikrê te ye şifa û derman[16]

Şoşî, di beşa "Sebebu Nezmi'l-Kitab bi'l-Luxet el-Kurdîyye (Egerê Vehandina *Gulzar*ê bi Zimanê Kurdî)" ya dibaceya mesnewîya xwe de sebebê nivîsîna berhemê weha destnîşan kirîye:

Mewzûn tu dibînî zor ji name

Çîrok û 'ilûm û şahname

Min fikr e bira ku ez bibêjim

Daxa li dilê xwe ez birêjim

[13] Şoşî, h.b., r. 12.
[14] Şoşî, h.b., r. 36.
[15] Şoşî, h.b., r. 7.
[16] Şoşî, h.b., r. 51.

Ez nezim bikem cuwan û saxlem
Tarîxê heyatê şahê 'alem

Jîn û esera wî dê vexwînim
Dê taze bi şi'r û çak vehînim

Behsê wî diken bi her zimanan
Medha wî diken li her mekanan

Emma me heta niho nedîne
Jîna wî bi Kurdîya şirîn e

Ey dil kesera te ya li mêj e
Wer wek te divê bi Kurdî bêje[17]

Ji van beytan em fêm dikin ku di Kurdî de nebûna jînnameyeke edebî ya cenabê Pêxember Şoşî han daye ku vê mijarê bi Kurdî binivîse. Herweha Şoşî di şêwaza edebî de jî dastan û şahnameyên tehkîyeyî ku bi forma mesnewîyê hatine nivîsîn ji xwe re kirine model ku li gorî bawerîya me, *Mem û Zîn*a Xanî jî di vê çarçoveyê de jêdereke *Gulzar*ê ye (bnr. beşa "Kêş"ê ya gotarê).

Şoşî mesnewîya xwe di pênc salên dawî yên temenê xwe de nivîsîye ku di vî wextî de bi nexweşîyeke giran re jî mucadele kirîye. Di sala 1956ê de di çil salîya xwe de dest bi nivîsîna *Gulzar*ê kirîye û heta bi dawîya sala 1961ê, berî ku wefat bike bi demeke hindik, bi nivîsîna wê re mijûl bûye. Şoşî beşên *Gulzar*ê pêşî bi şêweya reşnivîsê (muswedde) telîf kirine, piştre jî bi xetê xwe yê zelal û pak ji reşnivîsê derbasî ser kaxezên spî kirine (tebyîd). Ji ber ku Şoşî xettat bûye nusxeyeke bedew û bi rêk û pêk a *Gulzar*ê derketîye meydanê (Bo nimûne bnr. Pêvek 1-2-3). Lêbelê bivênevê rengvedana nerênî ya nexweşîya Şoşî li ser vî karî çe çêbûye. Şoşî bixwe li cihekî mesnewîyê di bin sernavê "Lêborîna Nivîskarî ji Xwendevanan" de dibêje ku nexewşîya min a ku heft sal berê dest pê kiriye û bêtaqetîya min a zêde dibe sedem ku lawazî û kêmasî bikeve xetê min. Lêbelê ji ber daxwaza xilaskirina berhemê, tesellîya qelb û aramîya zihnê xwe ez vî karî didomînim. Mebesta min ew e ku ez reşnivîsên berhemê, ne bi xetekî hunerî be jî, bi xetekî ku bê xwedin derbasî ser kaxeza spî bikim. Ji ber ku reşnivîsên min ne fêmbar in kesekî ku ez vî karî bispêrim ser milê wî û ji heq derkeve tuneye.[18] Mixabin dema Şoşî temamen ji taqet ketîye êdî prosesa derbaskirina ser kaxeza spî û bi awayekî siruştî telîfa berhemê ya bi şêweya reşnivîsê jî rawestîyaye. Rûpela herî dawîn a destnivîsa *Gulzar*ê ku asta hunera xetê bi temamî ketîye, bûye rûpela herî dawîn ku Şoşî ji reşnivîsê derbasî ser kaxeza spî kirîye.[19] Ev nusxeya *Gulzar*ê ku ji alîyê muellif bixwe ve hatîye nesxkirin di roja me de di pirtûkxaneya taybet a kurê wî Hemze Şoşî de tê parastin.

---

[17] Şoşî, h.b., r. 73.
[18] Şêx Tahirê Şoşî, *Gulzar*, nusxeya destnivîs, Pirtûkxaneya Taybet a Hemze Şoşî, r. 268.
[19] Şoşî, *Gulzar*, nusxeya destnivîs, r. 495.

Şoşî, di destpêka *Gulzar*ê de plana wê jî aşkera kirîye û mesnewî li ser muqeddîmeyek, pênc rewde û xatîmeyekê tertîb kirîye.[20] Li gor vê planê beşên mesnewîya Şoşî û naveroka beşan bi vî rengî ye:

| | |
|---|---|
| **Muqeddîme** | **:** Destpêkirina kitêbê, medhê Xwedê û Pêxember, mebesta nivîsîna kitêbê, nimûneyên bedewîya Qur'anê û taybetîyên dînê Îslamê. |
| **Rewdeya Yekem** | **:** Ji wîladeta Pêxember heta bi pêxembertîya wî. |
| **Rewdeya Duyem** | **:** Ji pêxembertîyê heta bi hicretê. |
| **Rewdeya Sêyem** | **:** Ji hicretê heta bi fetha Mekkehê. |
| **Rewdeya Çarem** | **:** Ji fetha Mekkehê heta bi hecca Weda'ê. |
| **Rewdeya Pêncem** | **:** Şekl û sûretê Pêxembe; exlaq û rabûn û rûniştina wî; taybetî û fezîlet kemalatên wî, şemaila wî, mu'cîzeyên wî, ehlê beyt û derdora wî, wefata wî û tayînkirina xelîfeyê xwe. |
| **Xatîme** | **:** Sîyera her çar xelîfeyên raşid ên ku piştî Pêxember rêvebirî kirine û dînê Îslamê belav kirine. |

Mixabin ji ber ku Şoşî di temenekî ciwan de wefat kirîye nekarîye plana jorîn tevî bibe serî. Loma wî ji beşên jorîn beşa çarem û xatîme qet nenivîsîne û beşa sêyem jî qismek jê nivîsîye. Şoşî beşa sêyem heta bi rûdanên sala sêyê koçî nivîsîne, ji bo rûdanên sala çarê koçî sernav danîye lêbelê li wê derê sekinîye û wereq vala hiştîne. Ji ber ku di plana wî ya jorîn de beşa sêyem rûdanên ji hicreta Pêxember heta bi fetha Mekkehê vedigire, em dizanin ku ev mawe dike heşt sal. Ji vê jî em fêm dikin di vê beşê de ji rûdanên 8 salan yên 3 salên ewil hatine nivîsîn lêbelê yên pênc salan mane. Li gor vê Şoşî teqrîbî ji sedî şêstê vê beşê nenivîsîye.

Li gor ku Şoşî qismê dawî yê beşa sêyem û tevahîya beşa çarem nenivîsîye, derdikeve meydanê ku di *Gulzar*ê de sîreta cenabê Pêxember ji destpêka jîyana wî heta bi sala sêyê koçî hatîye nivîsîn. Yanî heft salên dawî yên sîreta Pêxember nehatîye nivîsîn.

Berhem ji alîyê Hemze Şoşîyê kurê Şêx Tahirê Şoşî ve digel pêşgotinekê bo çapê hatîye amadekirin û di sala 2012an de ji alîyê Êkîtîya Nivîserên Kurd ve li Dihokê hatîye çapkirin. Lêbelê divê bê gotin ku di çapê de hin beşên *Gulzar*ê (Mu'cîzat û Pendname) nehatine weşandin.

## 4. AVAHÎYA DEREKÎ YA *GULZAR*Ê

*Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî yek ji mesnewîyên girîng ê edebîyata Kurdî ya klasîk e û bi taybetî jî ji alîyê avahîya xwe ya derekî ve wek mesnewîyeke xweser balê dikişîne ser xwe. Çawa tê zanîn di hunera helbestê de hêmanên ku bi awayekî şênber xîtabî çav û guhên mirovî dikin avahîya derekî ya helbestê saz dikin û ev jî esas di form (teşeyên nezmê) û hêmanên rîtmîk ên helbestê (kêş, serwa û hwd.) de xwe nîşan didin.[21] Lêbelê ji ber ku ji teşeyên nezmê bi taybetî mesnewî di berhemên serbixwe de tê bikaranîn bivênevê hêmanên derekî yên mesnewîyê firehtir dibin û qeware û tertîba berhemê, sernavên beşan, topografîya berhemê û helbestên hundurîn jî wek hêmanên nû li yên navborî zêde dibin. Bi awayekî

[20] Şoşî, *Gulzar*, nusxeya destnivîs, bêjimar (ji wereqên destpêkê).
[21] M. Orhan Okay, *Poetika Dersleri*, Dergâh, İst. 2011, r. 23-24.

siruştî ji ber ku *Gulzar* berhemek e hêmanên avahîya wê ya derekî ji yên helbestên dîwanan zêdetir in. Di vê beşa esasî ya gotarê de hêmanên bingehîn yên ku avahîya derekî ya *Gulzar*ê saz dikin di çarçoveya qeware, kêş, tertîba mesnewîyê û sernavên wê de yek yek dê bên analîzkirin û bi vî awayî taybetî û xweserîyên *Gulzar*ê yên di biwara avahîya derekî de dê li ber çavan bên raxistin.

## 4.1. Qeware

Çawa tê zanîn yekeyên nezmê (misra, beyt û bend) û serwa du hêmanên avahîya derekî ne ku teşeya nezmê saz dikin.[22] Di mesnewîyê de yekeya nezmê beyt e û her du misrayên beytê di nav xwe de hemserwa ne. Ev sîstema serwayê ya mesnewîyê di sazkirina beytan û nivîsîna berhemê de rehetîyekê dide mesnewînûs. Ji ber vê ye ku mesnewî bi gelek beytan tên nivîsîn û li gorî xezel û qesîdeyê gelekî dirêj in. Eger mesnewî wek xezel û qesîdeyê yekserwa bûya, yanî di hemû beytan de heman serwa bihata bikaranîn dê di dîtina peyvên serwayê de gelek zehmetî bihata kişandin. Berevajîyê vê mesnewînûs di serwaya beytan de azad tevdigre û di her beytekê de serî li serwayeke cuda dide. Ev sîstema serwayê jî azadî û rehetîyeke wisa dide mesnewînûs ku bi saya vê yekê bi hezaran beyt dikarin bên nivîsîn. Di encamê de qewareya mesnewîyan zêde dibe.[23]

Eger em li mesnewîyên edebîyatên Îslamî binêrin, em ê bibînin ku ji jimara beytên wan re sînorek nehatîye danîn. Mesnewînûsan li gor dilê xwe û bi qasî şîyana xwe dirûv dane qewareya mesnewîyên xwe. Di edebîyatên Îslamî de jimarên beytên hin mesnewîyan bi hezaran û yên hinan jî bi deh hezaran tên îfadekirin. Bo nimûne di edebîyata Farisî de jimara beytên *Şehname*ya Firdewsî li gor nusxeyan di navbera 48.000 û 52.000 beytan de[24] û yên *Mesnewî*ya Mewlana jî di navbera 25.585 û 26.660 beytan de[25] diguhere ku ev her du mesnewî ji alîyê qewareyê ve wek mesnewîyên herî mezin ên edebîyata Farisî derdikevin pêş. Divê neyê jibîrkirin ku qewareyên mesnewîyên Firdewsî û Mewlana lîmîta herî jorîn temsîl dikin û bi awayekî siruştî mesnewîyên dî yên edebîyata Farisî ji alîyê qewareyê ve di bin wan re ne. Di edebîyata Tirkî de jî *Îskendername*ya Ehmedî ku ji 8.000 beytan zêdetir e[26] di vî warî de wek mesnewîyeke girîng derdikeve pêş.

Dema em ji alîyê qewareyê ve li *Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî dinêrin, em dibînin ku *Gulzar* jî bi qewareyeke mezin hatîye nivîsîn ku jimara beytên wê digihîje 14.000 beytan.[27] *Gulzar*a Şoşî ji alîyê qewareyê ve ne bi qasî mesnewîyên Firdewsî û Mewlana be jî, ew bi vê qewareya xwe dîsa dê di nav kategorîya mesnewîyên mezin ên edebîyatên Îslamî de cih bigire. Lêbelê divê neyê jibîrkirin ku Şoşî ji ber wefata xwe ya zû nekarîya hemû beşên mesnewîya xwe temam bike. Wî beşa çarem û xatîme qet nenivîsîne û beşa sêyem jî ji sedî çilê wê nivîsîye. Eger em mesnewîya wî muqeddîme û xatîme di nav de wek heft beş qebûl bikin dê derkeve holê ku wî nêzî sê beşan nenivîsîye. Eger em nîvekîya beşekê herî kêm 2000-2500 beyt qebûl bikin ev tê wê wateyê ku halê temamkirî yê mesnewîyê dê ji halê heyî

[22] Ji bo agahîyên berfireh bnr. Adak, *Teşeyên Nezmê*, r. 97-99.
[23] Mensûr Restgar Fesaî, *Enwa'ê Şi're Farisî*, Şîraz 1373, r. 428.
[24] Mehmet Kanar, "Şâhnâme", TDV İslâm Ansiklopedisi, https://islamansiklopedisi.org.tr/sahname#1 (05.01.2021).
[25] Semih Ceyhan, "Mesnevî", TDV İslâm Ansiklopedisi, https://islamansiklopedisi.org.tr/mesnevi-mevlana (05.01.2021).
[26] İsmail Ünver, *Ahmedî, Îskender-name İnceleme Tıpkıbasım*, Türk Dil Kurumu Yay., Ankara 1983, r. 15.
[27] Şoşî, *Gulzar*, ber. Hemze Tahir Şoşî, r. 14.

5000-6000 beyt zêdetir bûya û koma beytên mesnewîyê dê bigiha dora 20.000 beytan.

Dema em ji alîyê edebîyata Kurdî ve li qewareya *Gulzar*ê dinêrin, bêguman cihê wê di nav edebîyata Kurdî de newaze ye û *Gulzar* ji alîyê vê qewareya xwe ve wek mesnewîyeke balkêş a edebîyata Kurdî derdikeve pêş. Lêbelê ji bo ku cihê *Gulzar*ê di nav mesnewîyên Kurdî de bi awayekî dirust bê destnîşankirin divê ji alîyê qewareyê ve rewşa giştî ya mesnewîyên edebîyata Kurdî li ber çavan bê girtin. Ji bo vê yekê jî em ê li jêrê çavekî li qewareyên mesnewîyên mezin ên edebîyata Kurdî ya klasîk bigerînin û bi vî awayî hewl bidin ku cihê *Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî di nav wan de tesbît bikin.

Di edebîyata Kurmancî de biçûk mezin gelek mesnewî hatine nivîsîn. Lêbelê li jêrê ji bo ku hizrekê bide me em ê di çarçoveya seyra tarîxî de cih bidin çend mesnewîyên girîng ên ku di vê edebîyatê de bi qewareyên xwe yên mezin derdikevin pêş:[28]

| **Jmr** | **Mesnewî** | **Nivîskar** | **Sedsal** | **Qeware** |
|---|---|---|---|---|
| 1 | *Mem û Zîn* | Xanî (k.d. 1707) | XVII | 2.656 beyt |
| 2 | *Yûsif û Zuleyxa* | Selîmî (k.d. piştî 1754an) | XVIII | 2.325 beyt |
| 3 | *Seyfilmilûk* | Sîyahpoş (k.d. 1831) | XIX (Nîveka Yekem) | 2.883 beyt |
| 4 | *Rewdu'n-Ne'îm* | Rûhî (k.d. 1907) | XIX (Nîveka Duyem) | 4.531 beyt |
| 5 | *el-Hemail fi'ş-Şemail* | Godîşkî (k.d. 2003) | XX | 5.569 beyt |
| 6 | *el-Cewahiru'r-Reşad*îye | Godîşkî | XX | 5.204 beyt |
| 7 | *Gulzar* | Şoşî (k.d. 1962) | XX | 14.000 beyt |

**Tablo 1:** Qewareyên Çend Mesnewîyên Mezin ên Kurdîya Kurmancî

Di çarçoveya van daneyan de dikare bê gotin ku mesnewîyên Kurdîya Kurmancî di sedsala XVIIem de bi qewareyeke navîn, di nîveka yekem a sedsala XIXem de bi qewareyeke zêdetir û di nîveka duyem a sedsala XIXem û sedsala XXem de jî bi qewareyên hêj mezintir hatine nivîsîn. Li gor van daneyan mesnewîya Şêx Tahirê Şoşî ku di qonaxa herî dawîn (sedsala XXem) de hatîye nivîsîn bi qewareya xwe ji hemû mesnewîyên dî zêdetir e.

[28] Adak, *Teşeyên Nezmê*, r. 260,

Dema em li mesnewîyên Kurdîya Goranî dinêrin, em dibînin di vê edebîyatê de mesnewîya *Îran û Tûran* ku hîkayeyeke şehnameya Kurdî ye (7000 beyt)[29] û mesnewîya Xanay Qubadî ya bi navê *Xusrew û Şêrîn* (5526 beyt)[30] bi qewareyên xwe yên mezin derdikevin pêş. Bêguman ev mesnewî jî di katgorîya mesnewîyên dirêj de cih digirin. Lêbelê jimarên beytên van mesnewîyan jî ji yên *Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî derbas nabin.

Heçî edebîyatên Soranî û Zazakî ne ji ber ku di wan de qada mesnewîyê zêde pêş neketîye mesnewîyên bi qewareyên mezin jî nehatine nivîsîn.[31] Loma di çarçoveya van daneyan de dikare bê gotin ku vê kêlîyê *Gulzar*a Şoşî di çarçoveya hemû dîyalektên edebî yên Kurdî de ji alîyê qewareya xwe ve ku teqrîbî ji 14.000 beytan pêk tê wek mesnewîya herî mezin a edebîyata Kurdî ya klasîk derdikeve pêş.

**4.2. Kêş**

Hêmaneke bingehîn a avahîya derekî ya helbestê jî kêş e ku Kurdî jî di nav de di nezm û helbesta klasîk a Îslamî de mebest ji kêşê "erûz" e. Di vê edebîyatê de berhemên bi teşeya mesnewîyê ji serî heta bi dawîyê bi heman qalibê kêşê tên nivîsîn ku ev qalib jî ji nav qalibên kurt ên erûzê tê hilbijartin. Sebebê vê ew e ku di mesnewîyan de jimara beytan zêde ye û eger qalibên dirêj ên erûzê bên bikaranîn mesnewînûs di nivîsîna berhemê de û xwîner jî di xwendina wê de dê tûşî zehmetîyê bên. Loma bikaranîna qalibên kurt ên erûzê taybetîyeke bingehîn a avahîya derekî ya mesnewîyan e.[32] Ev şêwaza ku cara pêşî di edebîyata Farisî de hatîye bikaranîn piştre di edebîyatên dî yên Îslamî yên wek Tirkî û Kurdî de jî hatîye domandin. Dema em li *Gulzar*a Şoşî dinêrin em dibînin ku ew jî bi qalibekî kurt ê erûzê hatîye nivîsîn û ya herî girîng ev qalib ji alîyê Şoşî ve bi taybetî hatîye destnîşankirin. Şoşî di dîbaceya *Gulzar*ê de derheqê kêşa berhemê de agahîyên berfireh dide ku beytên pêwendîdar li jêrê hatine dayîn:

Wezna wê çi'b lezzet û şirîn e
Nav ‘ilmê ‘erûzê nav çunîne

Lewra bi xisûsê her zimanek
Her şi‘rekê bo heyîn nîşanek

Ey dosto eger te arezû ye
Nezma vê şirîn kitêbê ko ye

Weznek ji wê ra me got bi dilxwaz
Hem rêk û rewan e ezm û awaz

[29] Behrûz Çemenara, "Deramedî ber Edebî Hemasî û Pehlewaniyê Kurdî ba Tekye ber Şahnameê Kurdî", *Custarhayê Edebî Mecelleê ‘Ilmî Pejûheşî*, s. 1390, j. 172, r. 136-137.
[30] Bender ‘Elî Ekber Şake, *el-Muessir el-Erebî we'l-Farisî ve't-Turkî fî Şi'r el-Xezel el-Kurdî el-Klasîkî*, Muesset Hemdî li't-Tiba'e we'n-Neşr, b.c., 2010, r. 104.
[31] Adak, *Teşeyên Nezmê*, r. 258.
[32] Fesaî, b.n., r. 258-259; https://ganjoor.net/ (jêgirtin: 21.11.2018).

Fe‘lun fe‘elun fe‘el fe‘ûlun

Ev çare Riyazê Nûr usûl in[33]

Bi îfadeyên vekirî Şoşî di van beytan de weha dibêje:

> “Min di *Rîyazê Nûr* (*Gulzar*)ê de bi dilxwazî wezneke şêrîn, lezîz, awazdar û herikbar bi kar anîye ku ew jî “fe‘lun fe‘elun fe‘el fe‘ûlun” e û ev her çar tef’ileyên erûzê ji *Gulzar*ê re bûne esas. Ev qalibê ku min di berhema xwe de bi kar anîye di nav ilmê erûzê de tuneye. Ev jî tiştekî siruştî ye, lewra li gor taybetîyên zimanan taybetîyên şi‘rê jî diguherin.”

Li vê derê Şoşî taybetîyên kêşa berhema xwe bi hûrgulî destnîşan dike û di vê mijarê de zanyarîyên girîng dide. Di nav van zanyarînda de jî bi taybetî derbirîna wî ya bi şêweya “ev qalib (fe‘lun fe‘elun fe‘el fe‘ûlun) di nav ilmê erûzê de tuneye” balê dikişîne. Lewra dema mirov bi awayekî sethî bifikire ji vê îfadeyê darazeke weha mezin jî dikare bê derxistin: “Ev qalib di tarîxa mesnewînûsîyê de cara pêşî ji alîyê Şoşî ve di *Gulzar*ê de hatîye bikaranîn.” Bêguman ev daraz bi xumam e û ji bo ku ev xumam ji holê rabe divê em bidin pey şopa bersiva vê pirsê: Gelo pêkan e ku ev qalib di nav edebîyatên Îslamî yên hezar sale de qet nehatibe bikaranîn û cara pêşî ji alîyê Şoşî ve hatibe dahênan?

Dema em ji alîyê kêşnasîyê ve li mijarê dinêrin em dibînin ku bi rastî jî ev qalib di erûza Erebî de tuneye.[34] Loma tiştekî asayî ye ku di mesnewîyên Erebî de ev qalib nehatibe bikaranîn. Lêbelê dema em li erûza Farisî dinêrin em rastî rewşeke cuda tên. Lewra di vê edebîyatê de qalibekî erûzê bi şêweya “mef‘ûlu mefa‘ilun fe‘ûlun” (hezeca museddesa exreb, meqbûz û mehzûf) heye ku ji alîyê nirxên rîtmîk ve bi temamî beramberî qalibê *Gulzar*ê tê û ev qalib ji Nîzamî û vir ve di edebîyata Farisî de û bi tesîra wê di edebîyata Tirkî de wek qalibekî standart ên mesnewîyên evînî hatîye bikaranîn.[35] Bi heman rengî Xanî jî ev qalibê standart di *Mem û Zîn*ê de bi kar anîye û xistîye nav edebîyata Kurdî.[36] Çawa ku li jêrê jî tê dîtin, ev qalibê standart ji sê û yê Şoşî ji çar tef’ileyan pêk bên jî her du qalib hem ji alîyê jimara hêceyan ve (10 hêce), hem jî ji alîyê nirxên hêceyan ên kurtî û dirêjîyê ve bi temamî wek hev in. Bi gotineke dî heman rîtm bi du şêweyên cuda hatîye formulekirin ku cudahîya wan dibe cudahîyeke şeklî.

**Qalibê standart:**

mef‘ûlu mefa‘ilun fe‘ûlun = (- - + + - + - + - -)

**Qalibê *Gulzar*ê:**

fe‘lun fe‘elun fe‘el fe‘ûlun = (- - + + - + - + - -)

Bi vî awayî derdikeve meydanê ku qalibê *Gulzar*ê di erûza Farsî, Tirkî û Kurdî de heye lê di ya Erebî de tuneye. Ji vê jî em têdigihin ku dema Şoşî dibêje “ev qalibê

---

33 Şoşî, *Gulzar*, ber. Hemze Tahir Şoşî, r. 76.

34 Xetîb et-Tebrîzî, *Kitabu’l-Kafî fi’l-‘Erûz we’l-Qewafî*, amd. El-Hessanî Hesen ‘Ebdullah, Mektebetu’l-Xancî, Qahire 1994.

35 Nazir Akalın, “Nizami-yi Gencevi ile Fuzuli-yi Bağdadi’nin Leyli u Mecnun Mesnevilerinin Tartışmalı Mukayesesi” *Türkiyat Araştırmaları Dergisi*, j.3, Konya 1997, r. 203-214; İbrahim Akyol, “Nevâî ile Fuzûlî’nin Leylâ ve Mecnûn Mesnevilerinin Yapı ve Konu Bakımından Karşılaştırılması”, *Dil ve Edebiyat Araştırmaları (DEA)*, sal: 2019, j. 20, r. 282.

36 Adak, *Teşeyên Nezmê*, r. 254-255, 261-265.

erûzê di nav ilmê erûzê de tuneye" mebesta wî erûza Erebî ye. Ji ber ku danerên ilmê erûzê Ereb in ji îfadeya "ilmê erûzê" erûza Erebî qesd kirîye. Herweha dema Şoşî di dewamê de dibêje "li gor taybetîyên zimanan taybetîyên şi'rê jî diguherin." mebesta wî ew e ku taybetîyên zimanê Kurdî ji yên Erebî cuda ne û tiştekî asayî ye ku qalibekî ku di erûza Erebî de nehatibe bikaranîn di erûza Kurdî de bê bikaranîn. Ji alîyekî dî ve em dizanin ku Şoşî *Mem û Zîn*a Xanî ya ku bi heman kêşê hatîye nivîsîn bi dest xistîye, nas kirîye û piştre dest bi nivîsîna *Gulzar*ê kirîye.[37] Loma em bi dikarin bibêjin ku di kêşa *Gulzar*ê de jêdera Şoşî *Mem û Zîn*a Xanî ye. Şoşî di wê ferqê de ye ku kêşa berhema wî berî wî ji alîyê Xanî ve di *Mem û Zîn*ê de hatîye bikaranîn. Dema em vê yekê û nêrîna wî ya bi şêweya "li gor taybetîyên zimanan taybetîyên şi'rê jî diguherin" pêkve hizir bikin em ê fêm bikin ku Şoşî esas weha dibêje: "Ev qalibê ku min di *Gulzar*ê de bi kar anîye di erûza Erebî de tuneye û taybetîyeke erûza Kurdî ye".

Li vê derê pirsgirêkek dimîne ku ew jî şêweya formulasyonê ye. Madem Şoşî di *Gulzar*ê de kêşa *Mem û Zîn*ê bi kar anîye, çima ev kêş ne bi tef'îleyên standart ên kêşa *Mem û Zîn*ê bi hin tef'ileyên cuda formule kirîye? Bi bawerîya me sedemê vê ew e ku Şoşî formulasyona kêşa *Mem û Zîn*ê ya bi şêweya standart di tu jêderan de bi awayekî nivîskî nedîtîye, loma jî wî ev kêşa ku di erûza Erebî de nimûneyên wê tunene li gor xwe formule kirîye.

Nebûna jêderên erûza Kurdî ku di wan de qalibê kêşa *Mem û Zîn*ê hatibe nivîsîn tiştekî fêmbar e. Çawa tê zanîn berî Şoşî di serdema klasîk de ji bilî *Nûbihara Biçûkan* a Xanî û li ser erûza Kurdî tiştek nehatîye nivîsîn û di tarîxa kêşnasîya Kurdî de berhema yekem ku derheqê erûzê de hatîye nivîsîn her *Nûbihara Biçûkan* e.[38] Lêbelê bi awayekî balkêş di nav 13 qalibên erûzê yên *Nûbihara Biçûkan* de ku bi mebesta fêrkirinê hatine nivîsîn qalibê *Mem û Zîn*ê tuneye.[39] Yanî nivîskarê *Mem û Zîn*ê bixwe di berhema xwe ya li ser erûzê de cih nedaye qalibê *Mem û Zîn*ê. Di esasê xwe de ev jî tiştekî asayî ye. Lewra *Mem û Zîn* piştî *Nûbihara Biçûkan* hatîye nivîsîn û tiştekî siruştî ye ku Xanî di *Mem û Zîn*ê de qalibekî nû û ji yên *Nûbihara Biçûkan* cuda bi kar anîbe. Dikare bê gotin ku Xanî piştî nivîsîna *Nûbihara Biçûkan*, *Leyla û Mecnûn*a Nîzamî nas kirîye û kêş jî di nav de hêmanên wê yên derekî di *Mem û Zîn*a xwe de cîbicî kirine. Wek encam ji ber ku Şoşî *Nûbihara Biçûkan* di serî de di tu jêderan de formula qalibê *Mem û Zîn*ê nedîtîye, wî bixwe kêşa berhema xwe ku bi ya *Mem û Zîn*ê re hevpar e formule kirîye.

Di çarçoveya van analîzan de em dikarin li ser kêşa *Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî van encaman bi dest bixin:

- Di *Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî de wek hemû mesnewîyên dirêj ên edebîyatên Farisî, Tirkî û Kurdî rî'ayetî bikaranîna qalibên kurt ên kêşa erûzê hatîye kirin.
- Şoşî ji *Mem û Zîn*a Xanî haydar e û di kêşa berhema xwe de li pey şopa wî çûye.

[37] Şoşî hêj berî ku dest bi nivîsîna *Gulzar*ê bike nusxeyeke *Mem û Zîn*ê ya ku ji alîyê Gîwê Mukrîyanî ve hatîye çapkirin (çapxaneya Kurdistan, Hewlêr 1954) ji bo xwe temîn kirîye. Ev nusxeya *Mem û Zîn*ê niha di pirtûkxaneya taybetî ya kurê wî Dr. Hemze Şoşî de tê parastin. Ji bo ku ev zanyarî û wêneyên vê nusxeyê bi me re parve kirin ez spasîyên xwe pêşkêşî kurê Şêx Tahirê Şoşî Dr. Hemze Şoşî dikim.

[38] Ehmed Herdî, *el-Erûz fi'ş-Şi'ri'l-Kurdî*, *el-Mecme'u'l-'Ilmî el-Kurdistanî*, Erbîl 2004, r. 32.

[39] Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk,* Nûbihar, İstanbul, 2014, r. 385-386.

- Herçiqas Şoşî kêşa *Mem û Zîn*ê bi kar anîbe jî formulasyona ku wî ji bo qalibê kêşê kirîye ji ya standart cuda ye. Wî ji bo ku rîtma *Mem û Zîn*ê ya ku di erûza Erebî de tuneye formule bike teşebbusek kirîye.

- *Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî digel ku ji alîyê naverok û cureyê ve di kategorîya mesnewîyên dînî de ye jî ne bi qalibên wan ên berbelav[40] bi qalibê mesnewîyên evînî hatîye nivîsîn. Bi taybetî cudahîya qalibê wê ji ya mewlûdnameya Bateyî (fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun) ku her du jî derheqê Cenabê Pêxember de ne pir balê dikişîne. Bi bawerîya me Şoşî ji mewlûdnameya Bateyî haydar e, lêbelê ji ber ku xwestîye mesnewîyeke mezin a tehkîyeyî binivîse ne li pey şopa Bateyî li pey şopa Xanî çûye.

### 4.3. Tertîb

Tertîba mesnewîyê hêmaneke bingehîn a binyada wê ya derekî ye ku hûrgulîyên wê zêde ne. Çawa ku hatibû gotin, mesnewî menzûmeyên dirêj in û di wan de bi piranî mijarên çîrokî cih digirin û ji ber vê jî wek berhemên pexşan ên çîrokî dikevin nav tertîb û plansazîyeke taybet. Di çarçoveya standarta edebîyata klasîk a Îslamî de mesnewî ji alîyê tertîbê ve ji sê beşên bingehîn pêk tên: Beşa dîbaceyê (destpêk), beşa sereke û beşa xatîmeyê (encam). Ev sîstema mesnewîyê di edebîyata Farisî de ava bûye û ji wê derbasî edebîyatên dî yên Îslamî (Tirkî, Urdu û Kurdî) jî bûye. Di mesnewîyên çîrokî yên edebîyata Kurdî ya klasîk de ev şêwaza tertîbê bi giştî hatîye şopandin.[41] Lêbelê digel vê jî tiştekî siruştî ye ku di tertîba her mesnewîyekê de hin taybetîyên cuda û xweser jî hebin.

Çawa ku di beşa "*Gulzar*a Şoşî bi Awayekî Giştî" de jî derbas bû, Şêx Tahirê Şoşî di destpêka mesnewîya xwe de tertîba wê aşkera kirîye û *Gulzar* li ser muqeddîmeyek (dîbace), pênc rewde (mijara sereke) û xatîmeyekê dabeş kirîye û li hemberî wan jî naveroka wan destnîşan kirîye[42]. Em ê jî li jêrê vê tertîba *Gulzar*ê bi hûrgulî raxin ber çavan û taybetî û xweserîyên wê destnîşan bikin.

### 4.4.1. Beşa Dîbaceyê

Di tradîsyona mesnewînûsîyê de mesnewî, wek berhemên pêxşan, bi beşên dîbace/muqeddîmeyê dest pê dikin û hin mijarên dîyar hene ku di van dîbaceyan de bi awayekî standart cih digirin. Di çarçoveya mesnewîyên Farisî û Tirkî de mijarên ku di dîbaceyên mesnewîyan de cih digirin weha hatine tesbîtkirin: Besmele, tehmîd, tevhîd, munacat, ne't, mi'rac, şefa'et, mu'cizât, medhê çehâr yâr, medhê padîşah, medhê mezinên dewletê û sebebê te'lîfê. Ji van mijaran tewhîd, munacat û ne't bi saîqên dînî, medhîye bi saîqa civakî, sebebê telîfê jî jî bi saîqa edebî hatine nivîsîn. Bêguman ev nayê wê wateyê ku hemû mesnewînûsan rî'ayetî tevahîya van mijaran kirine. Dikare bê gotin ku mesnewînûsan di destpêka mesnewîyan de hebûna mijarên dînî şert dîtine, lêbelê di mijarên dî de azad tevgerîyane. Hin mesnewînûsan hin ji mijarên navborî yên dîbaceyê terk kirine, hinan jî hin mijarên nû lê zêde kirine.[43]

---

[40] Ji bo zanyarîyên berfireh bnr. Adak, *Teşeyên Nezmê*, r. 262-263.
[41] Ji bo zanyarîyên berfireh bnr. Adak, *Teşeyên Nezmê*, r. 267-268.
[42] Şêx Tahirê Şoşî, *Gulzar*, nusxeya destnivîs, bêjimar (ji wereqên destpêkê).
[43] Ünver, "Mesnevi-Türk Edebiyatı" https://islamansiklopedisi.org.tr/mesnevi#2-turk-edebiyati, r. 322-324; Mustafa Çiçekler, "Mesnevi" TDV İslâm Ansiklopedisi, https://islamansiklopedisi.org.tr/mesnevi#1, r. 320.

Dema em li edebîyata Kurdî dinêrin em dibînin ku ev şêwaz di vê edebîyatê de jî, bi awayekî giştî, hatîye şopandin. Di çarçoveya çend mesnewîyên bingehîn ên edebîyata Kurmancî de (*Mem û Zîn*a Xanî, *Yûsif û Zuleyxa*ya Selîmî, *Leyla û Mecnûn*a Sewadî, mewlûdnameya Bateyî, *Rewdu'n-Ne'îm*a Rûhî, *Leyla û Mecnûn*a Xakî, *'Iqdê Durfam*a Eskerî û *Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî) mijarên ku di dîbaceyên mesnewîyên Kurdî de cih digirin weha hatine tesbîtkirin: Besmele, tehmîd, sena, tewhîd, munacat, ne'‘t, mi'‘rac, şefa'‘et, çar xelîfe, medhîye, sebebê te'lîfê, amanc, girîngî, çavkanî, tarîx, lêborîn, saqîname û muxennîname.[44]

Heçî *Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî ye, mijarên ku di dîbaceya wê de cih digirin li jêrê digel sernavan hatine rêzkirin:[45]

1. Tehmîd : Bê sernav e.
2. Sena : es-Sena' ‘Elellah (Hemd û Sipasî bo Xudayê Mezin)
3. Ne‘t : Fî Medhi'r-Resûl ‘Eleyhi's-Selam (Di Pesnêt Pêxemberî)
4. Al û Eshab : Senau'l-Al we'l-Eshab (Medhên Xizm û Hevalan)
5. Amanc : Îfadetu'l-Meram (Mefa û Amanca *Gulzar*ê)
6. Girîngî : Ehemmiyetu Nezmi'l-Kitab (Girîngiya Vehandina Wê)
7. Sebebê Te'lîfê : Sebebu Nezmi'l-Kitab bi'l-Luxet el-Kurdiyye (Egerê Vehandina *Gulzar*ê bi Zimanê Kurdî)
8. Çavkanî : Be‘du Mesadiru'l-Kitab (Çend Jêderêt Kitêbê)
9. Tarîx : Tarîxu'l-Ibtida' bi Nezmi'l-Kitab (Mêjuya Despêkirina Vehandina Dastanê)
10. Lêborîn : el-I‘tizar ile'l-Qurra' el-Exyar (Lêborîn bo Xandevanêt Hêja)

Hêjayî gotinê ye ku Şoşî piştî van mijaran li ser gelek mijarên dî yên bi zanista Quranê û hizra Îslamî re têkildar jî rawestîyaye.[46] Bêguman ev mijar jî di dîbaceya *Gulzar*ê de cih digirin, lêbelê ji alîyê şêwaza mesnewînûsîyê ve nakevin kategorîya mijarên dîbaceyê yên standart. Bi bawerîya me ev wek beşeke serbixwe ku ji mijara sereke ya *Gulzar*ê re bibe amadehîyek bê nirxandin minasibtir e.

Dema em dîbaceya *Gulzar*ê bi dîbaceyên mesnewîyên dî yên navborî re muqayese dikin encameke weha derdikeve meydanê: Hin mijar hene ku tenê di dîbaceya Şoşî de cih digirin û hin mijar jî hene ku di mesnewîyên dî de cih digirin lêbelê di ya Şoşî de cih nagirin. Ji van mijaran yên ku tenê di dîbaceya Şoşî de cih digirin ev in: Sena, amanc, girîngî, çavkanî, tarîx û lêborîn. Mijarên ku di dîbaceya Şoşî de cih nagirin jî ev in: Besmele, tewhîd, munacat, mi‘rac, şefa‘et, medhîye, saqîname û muxennîname. Çawa ku me gotibû di dîbaceyên mesnewîyên Kurdîya Kurmancî de mesnewînûsan rîayetî hebûna mijarên dînî kirine, lêbelê di mijarên dî de azad tevgerîyane. Dema em ji vî alîyî ve li van daneyan binêrin em dê bibînin ku Şoşî jî di vê çarçoveyê de rî‘ayetî mijarên dînî kirîye û di mijarên ne dînî de azad tevgerîyaye.

[44] Ji bo zanyarîyên berfireh bnr. Adak, *Teşeyên Nezmê*, r. 270-273.
[45] Şoşî, *Gulzar*, ber. Hemze Tahir Şoşî, r. 51-79.
[46] Şoşî, *Gulzar*, h.b., r. 79-96.

Bêguman tiştekî asayî ye ku Şoşî hemû mesnewîyên navborî nedîtîbin. Dîtina wî ya *Leyla û Mecnûn*a Sewadî, *Yûsif û Zuleyxa*ya Selîmî û mewlûdnameya Bateyî ku mesnewîyên serdema mîrektîyan in pêkan be jî, dîtina wî ya *Rewdu'n-Ne'îm*a Rûhî, *Leyla û Mecnûn*a Xakî, *'Iqdê Durfam*a Şêx Eskerî zehmet dixuye. Lêbelê, çawa ku li jorê behsa wê derbas bû, em teqez dizanin ku wî *Mem û Zîn*a Xanî dîtîye û bi awayekî ketîye bin bandora wê jî. Herweha em dizanin ku *Mem û Zîn* ji *Rewdu'n-Ne'îm*a Rûhî re jî bûye jêdereke bingehîn. Ji alîyekî dî ve *Mem û Zîn* ji bo serdema mîrektîyan û *Rewdu'n-Ne'îm* jî ji bo serdema piştî mîrektîyan wek mesnewîyên herî girîng û ji alîyê dîbaceyên xwe ve jî herî orjînal derdikevin pêş. Loma em ê li jêrê mijarên ku di dîbaceyên van her sê mesnewîyan (*Mem û Zîn*, *Rewdu'n-Ne'îm* û *Gulzar*) de cih digirin rêz bikin, piştre jî di tabloyekê de dîbaceyên wan berawird bikin û hin encaman bi dest bixin:

**Dîbaceya *Mem û Zîn*ê**[47] **:** Tevhîd, Munacat, Ne't, Mi'rac, Şefa'et, Medhiye, Sebebê Te'lîfê, Saqîname.

**Dîbaceya *Rewdu'n-Ne'îm*ê**[48]**:** Besmele, Tehmîd, Tewhîd, Ne't, Sebebê Te'lîfê, Saqîname û Muxennîname.

**Dîbaceya *Gulzar*ê**[49] **:** Tehmîd, Sena, Ne't, Al û Eshab, Amanc, Girîngî, Sebebê Te'lîfê, Çavkanî, Tarîx, Lêborîn.

| **Dîbaceya *Mem û Zîn*ê** | | **Dîbaceya *Rewdu'n-Ne'îm*ê** | | **Dîbaceya *Gulzar*ê** | |
|---|---|---|---|---|---|
| | - | 1 | Besmele | | - |
| 1 | Tewhîd | 3 | Tewhîd | | - |
| | - | 2 | Tehmîd | 1 | Tehmîd |
| | - | | - | 2 | Sena |
| 2 | Munacat | | - | | - |
| 3 | Ne't | 4 | Ne't | 3 | Ne't |
| 4 | Mi'rac/Şefa'et | | - | | - |
| | - | | - | 4 | Al û Eshab |
| | - | | - | 5 | Amanc |
| | - | | - | 6 | Girîngî |
| 5 | Medhîye | | - | | - |

47 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. Huseyn Şemrexî, Nûbihar, İst 2009, r. 15-54.
48 Şêx Ebdurehman Aqtepî, *Rewdu'n-Ne'îm*, (amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, Spîrêz, Dihok 2011, r. 21-47.
49 Şoşî, *Gulzar*, ber. Hemze Tahir Şoşî, r. 51-79.

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| 6 | Sebebê Te'lîfê | 5 | Sebebê Te'lîfê | 7 | Sebebê Te'lîfê |
| | - | | - | 8 | Çavkanî |
| | - | | - | 9 | Tarîx |
| | - | | - | 10 | Lêborîn |
| 7 | Saqîname | 6 | Saqîname û Muxennîname | | - |

**Tablo 2:** Muqayeseya dîbaceyên *Mem û Zîn*, *Rewdu'n-Ne'îm* û *Gulzar*ê.

Di çarçoveya muqayeseya jorîn de li ser dîbaceya *Gulzar*ê hin encamên bi vî rengî dikarin bên bidestxistin:

1. Ji ber ku Şoşî *Mem û Zîn*a Xanî mitale kirîye guman namîne ku di sazkirina dîbaceya *Gulzar*ê de qet nebe jêdereke Şoşî *Mem û Zîn*a Xanî ye. Tradîsyona beşên dîbaceyê yên mesnewîyên Kurmancî cara pêşî ji alîyê Xanî ve ji edebîyata Farisî (bi taybetî ji Nîzamî) hatîye wergirtin û piştre jî bê rêya Xanî ji alîyê mesnewînûsên wek Rûhî û Şoşî ve hatîye şopandin.

2. Di navbera dîbaceyên *Mem û Zîn*ê û *Gulzar*ê de çawa ku hevparî hene cudahîyên bingehîn jî hene.

3. Di dîbaceya *Mem û Zîn*ê de 7 beş û 8 mijar û di ya *Gulzar*ê de 10 beş/mijar cih digirin. Heçî *Rewdu'n-Ne'îm* e di dîbaceya wê de 6 beş û 7 mijar cih digirin.

4. Di her sêyan de jî beşên ku bi mijarên dînî re têkildar in û beşa sebebê telîfê hene. Ev jî wek mijarên hevpar û jêneger ên van dîbaceyan derdikevin pêş.

5. Medhîye û Saqînameya ku di *Mem û Zîn*ê de cih digirin di *Gulzar*ê de; amanc, girîngî, çavkanî, tarîx û lêborîna ku di *Gulzar*ê de cih digirin di *Mem û Zîn*ê de tunene. Ji ber ku di *Mem û Zîn*ê de alîyê edebî û lîrîk zal e di dîbaceya wê de mijareke wek saqînameyê edebî û lîrîk; ji ber ku di *Gulzar*ê de alîyê zanistî û dîdaktîk zal e di dîbaceya wê de jî mijarên wek amanc, girîngî û çavkanîyê ku bi vekolînê re têkildar in cih digirin.

6. Ehmedê Xanî bi saqînameyê, Rûhî bi muxennînameyê, Şoşî jî bi mijarên wek amanc, girîngî, çavkanî û tarîxê nûawerî kirîne.

7. Mijarên nû ku Şoşî xistine nav dîbaceya xwe gelek in (amanc, girîngî, çavkanî û tarîx) û ev mijar *Mem û Zîn* û *Rewdu'n-Ne'îm* jî di nav de di çarçoveya hemû mesnewîyên Kurdîya Kurmancî yên navborî de tenê di dîbaceya Şoşî de cih digirin. Bêguman ev yek wek xweserîyeke girîng a *Gulzar*ê derdikeve pêş. Ev jî bi cureya berhemê û bi alîyê Şoşî yê vekolînerîyê ve têkildar in.

8. Di *Gulzar*ê de piştî dîbaceyê û berî mijara sereke a berhemê gelek mijarên bi zanista Quranê û hizra dînî ve têkildar jî cih digirin ku bi qasî ku tê dîtin ev şêwaz di dîbaceyên mesnewîyên Kurdî de cara yekem ji alîyê Şoşî ve hatîye bikaranîn. Ev jî bi cureya berhemê û bi alîyê wî yê vekolînerîya wî ve têkildar e

9. Dibaceya Şêx Tahirê Şoşî digel yên Xanî û Rûhî ji alîyê mijaran ve dîbaceyên herî dewlemend ên mesnewîyên Kurdî ne.

### 4.4.2. Beşa Sereke

Beşa sereke, beşa herî berfireh a mesnewîyê ye ku tê de mijara bingehîn a mesnewîyê bi hûrgulî tê pêşkêşkirin. Di tertîba mesnewîyê de beşa sereke piştî dîbaceyê û berî xatîmeyê cih digire. Di vê beşê de mijar bi piranî wek xelekên zincîrî bi hev ve girêdayî ne û ji bo her xelekekê sernavek tê bikaranîn. Di edebîyatên Farisî û Tirkî de xeleka yekem a beşa sereke di bin sernavên wek "axazê dastan", "axazê qisse" û "metle'ê dastan" de tê nivîsîn ku hemû jî wateya destpêka dastanê didin. Ji van sernavan tê fêmkirin ku dîbaceya mesnewîyê qedîyaye û êdî beşa sereke dest pê kirîye. Dema wek mesnewîya yekem a edebiyata Kurdî (Kurmancî) em li *Mem û Zîn*a Xanî dinêrin, em dibînin ku di serê beşa sereke ya *Mem û Zîn*ê de ji bo vê armancê îfadeya "mebdeê meqal" hatiye bikaranîn. Balkêş e ku Xanî di vê mijarê de ji aliyê mesnewînûsên piştî xwe ve ku li jorê di mijara dîbaceyê de behsa wan hat kirin, nehatiye şopandin. Di dîbaceyên mesnewîyan de mijar dîyar in. Di vê çarçoveyê de di piranîya dîbaceyan de mijarên dînî û mijara sebebê telîfê cih digirin. Lêbelê di beşên sereke de rewşeke weha standart tuneye; mijarên beşên sereke guherbar in.[50]

Dema em di çarçoveya van zanyarîyên giştî de li beşa sereke ya *Gulzar*ê dinêrin em dibînin ku Şoşî jî di beşa sereke ya mesnewîya xwe de bi hûrgulî û dûrûdirêj li ser mijara berhema xwe rawestîyaye ku ew jî sîyera cenabê Pêxember e. Ji ber ku sîyera cenabê Pêxember û mijarên pêwendîdar ji qonaxên curbicur û rêzebûyeran pêk tên vê yekê rengê xwe daye dabeşkirina beşa sereke jî. Şoşî beşa sereke li gor sîstematîkeke taybet pêşî li ser pênc "rewde"yan, rewde jî di nav xwe de li ser "zehre"yan û zehre jî li ser binbeşên navxweyî dabeş kirîne. Hêjayî gotinê ye ku amadekarê berhemê Hemze Şoşî rewde wek mêrg, zehre wek gul û binbeşên zehreyê jî wek kulîlk kirine Kurmancî. Lêbelê çawa ku di beşa pêwendîdar a vê gotarê de hatibû îzahkirin Şoşî ji van pênc beşan beşa çarem qet nenivîsîye û beşa sêyem jî ji sedî çilê wê nivîsîye. Şoşî wek sîstema mesnewîyên mezin li jora tevahîya van beşan sernav danîne. Çawa ku em ê li jêrê di beşeke serbixwe de li ser rawestin ev sernav bi Erebî ne.

Di sernavê yekem a beşa sereke de îfadeyeke wek "axazê dastan" yan jî "mebdeê meqal" nehatîye bikaranîn ku îfadeyên bi vî rengî di *Mem û Zîn*a Xanî û mesnewîyên dî yên edebîyatên Îslamî de wek tradîsyoneke edebî hatine bikaranîn. Lêbelê ev heye ku dema Şoşî beşeke bingehîn (rewde/mêrg) xilas dike û dest bi beşeke nû dike ji bo encam û pêşekîyê sernavên serbixwe bi kar tîne. Wek "Temhîdu'r-Rewdeti'l-Ûla/Pêşgotina Mêrga Êkê"[51] û "Xitamu'r-Rewdeti's-Sanîye/Dîmahîka Mêrga Duwê" (bnr. Pêvek 4).[52] Aşkera ye ku Şoşî her beşeke *Gulzar*ê wek berhemeke serbixwe hizir kirîye û wek şêwaza berhemên zanistî cih daye pêşekî û encamên wan beşan.

Mesnewîya Şoşî ji alîya plana beşa sereke ve dikeve kategorîya mesnewîyên ku planên wan dîyar in. Lewra bi temamî ne wek eqîdenameyan be jî di sîyerên menzûm de jî mijarên standart hene û ji ber vê jî nivîsîna mijarê li gor planeke dîyar û hevbeş tiştekî asayî ye. Lêbelê digel vê jî, ji ber ku di Kurdîya Kurmancî de sîyerên menzûm ên ku bi qewareya xwe ji *Gulzar*ê re bibin muadil tunene û di vê çarçoveyê de ji ber ku di *Gulzar*ê de digel bîyografîya kronolojîk a Cenabê

---

[50] Ji bo zanyarîyên berfireh derheqê beşa sereke de bnr. Adak, *Teşeyên Nezmê*, r. 310-314.
[51] Şoşî, *Gulzar*, ber. Hemze Tahir Şoşî, r. 98.
[52] Şoşî, *Gulzar*, h.b., r. 361.

Pêxember gelek mijarên dî yên derheqê wî de cih digirin bivênevê beşa sereke a *Gulzar*ê ji alîyê plana xwe ve jî xweserîyekê bi dest bixe. Beşa sereke ya *Gulzar*ê bi taybetî bi sîstematîka xwe wesfê beşa bingehîn a mesnewîyê heq kirîye.

### 4.4.3. Beşa Xatîmeyê

Beşa xatîmeyê ya mesnewîyan, beşa xilaskirin û dawîlêanîna mesnewîyê ye. Di nav beşa xatîmeyê de bi piranî binbeş tunene û ji ber vê jî di beşa xatîmeyê de tenê sernavek tê bikaranîn. Di beşên xatîmeyê de, wek beşên dîbaceyê, hin mijarên standart cih digirin ku ew jî bi giştî ev in: Hemd û spasîya ji bo Xudayê Teala, pesnê ji bo sultan, şanazîya helbestvan bi berhem û helbestên xwe, zikirkirina navên mesnewînûsên navdar, zanyarîyên derheqê mesnewîyê de û dawaza dua û fatîheyan ji xwîneran. Lêbelê divê ev jî bê gotin ku ne lazim e di hemû xatîmeyan tevahîya van mijaran cih bigirin. Herweha dibe ku di hin xatîmeyan de hin mijarên cuda jî cih bigirin.[53]

Dema em ji alîyê xatîmeyê ve li *Gulzar*ê dinêrin em dibînin ku beşa xatîmeyê tê de cih nagire. Bêguman ev ne kêmasîyeke binyada derekî ya mesnewîyê ye ku ji îhmala mesnewînûs neşet dike. Ji ber ku mesnewînûsê me di esnayê nivîsîna mesnewîyê de bêyî îradeya xwe ji vê cîhanê bar kirîye îmkana xilaskirina mesnewîyê û nivîsîna xatîmeyê bi dest neketîye. Jixwe Şoşî di destpêka mesnewîyê de plana wê aşkera kirîye, mesnewî li ser muqeddîmeyek, pênc rewde û xatîmeyekê tertîb kirîye û nîyeta xwe ya di biwara nivîsîna xatîmeyê de îfade kirîye. Şoşî li vê derê mijara xatîmeyê wek sîyera her çar xelîfeyên raşid ên ku piştî Pêxember rêvebirî kirine û tarîxa serdema wan destnîşan kirîye. Em di wê bawerîyê de ne ku eger temenê Şoşî têrê bikira û îmkana nivîsîna beşa xatîmeyê bi dest bixista dê cih bida piranîya xalên ku di xatîmeyan de li ser wan tê rawestan û xatîmeya wî dê bibûya xatîmeya herî berfireh a mesnewîyên Kurdî. Qewareyên mezin û hûrguliyên curbicur ên dibace û beşa sereke nîşaneyên vê yekê ne.

### 4.5. Sernav

Çawa ku berê jî hatibû gotin, berhemên ku bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsîn dirêj in û zêdetir ji mijarên çîrokî pêk tên. Ji ber ku di berhemên bi vî rengî de mijar xelek bi xelek tê pêşkêşkirin her xelekeke mijarê dibe binbeşeke serbixwe ya berhemê. Bi taybetî beşa mijara sereke ku beşa bingehîn a mesnewîyan e gelekî dirêj e û bi awayekî siruştî xelekên herî zêde di mijara sereke de cih digirin. Herweha di beşa dîbaceyê de jî çend binbeşên standart cih digirin.[54] Li vê derê xala ji bo me girîng ew e ku di mesnewîyan de ji bo van binbeşan sernav tên bikaranîn ku ev jî hêmaneke derekî ya şêwaza mesnewînûsîyê ye.

Sernavên ku di binbeşên mesnewîyan de tên bikaranîn, bi taybetî ji alîyê ziman ve balê dikişînin. Lewra mesnewî bi Kurdî bin jî sernavên hemûyan ne bi Kurdî ne. Hêjayî gotinê ye ku ev yek di mesnewîyên Tirkî de jî tê çavdêrîkirin.[55] Di çarçoveya mesnewîyên Kurdîya Kurmancî de dikare bê gotin ku sernav di mesnewîyên dastanî-lîrîk de (*Mem û Zîn*a Xanî, *Leyla Mecnûn*a Sewadî, *Yûsif û Zuleyxa*ya Selîmî, *Leyla û Mecnûn*a Şêx Mihemed Can û *Iqdê Durfam*a Şêx Eskerî) bi giştî bi Kurdî, di yên dînî-lîrîk de (mewlûdnameya Bateyî û *Rewdu'n-Ne'îm*a Rûhî) bi Farisî û di yên dînî-dîdaktîk de (*Nehcu'l-Enam*a Mela Xelîlê

[53] Ünver, "Mesnevi-Türk Edebiyatı", r. 322-324.

[54] Adak, *Teşeyên Nezmê*, r. 267-321.

[55] Ji bo yên Tirkî bnr. Ünver, "Mesnevi-Türk Edebiyatı", r. 322-324.

Sêrtî, eqîdenameya Mela Nesredînê Zoqeydî û ya Mela Ehmedê Heyderî) bi Erebî hatine nivîsîn.[56]

*Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî jî mesnewîyeke dînî-dîdaktîk e û sernavên wê jî wek *Nehcu'l-Enam*a Mela Xelîlê Sêrtî ku mesnewîyeke girîng a heman cureyê ye bi Erebî ne. Pir aşkera ye ku pêwendiya bikaranîna sernavên Erebî di mesnewîyên dînî-dîdaktîk de bi zimanê zanistên Îslamî re heye ku ew jî Erebî ye. Herweha kesayetên ku bi vê cureyê berhem nivîsîne alimên medreseyê ne û di heman demê de pisporên zimanê Erebî ne jî. Vê paşxana bi hêz a Erebî di çarçoveya sernavan de rengê xwe daye mesnewîyên Kurdî yên alimên medreseyan jî. Di esasê xwe de ji ber ku di medreseyên Kurdan de berhemên pexşan ên zanistî bi Erebî ne û zimanê Kurdî roleke wisa bi dest nexistîye alimên ku mehsûlê vê çandê ne fêr nebûne ku Kurdî di pexşanê de bi kar bînin. Loma van aliman Kurdî bi taybetî di helbest û nezmê de bi kar anîne. Di vê çarçoveyê de di mesnewîyên xwe de beşên menzûm bi Kurdî lêbelê, rêzek be jî, beşên pexşan bi Erebî nivîsîne. Dîsa danîna navên Erebî bo mesnewîyên Kurdî jî her di vê çarçoveyê de ye. Şoşî jî navê mesnewîya xwe ya ku mijara me ye bi Erebî danîye *Riyadu'n-Nûr*. Lêbelê ev heye ku digel navê wê yê Erebî bi Kurmancî navê *Gulzar*ê jî li berhema xwe kirîye ku ev yek wek xaleke erenî dikare bê nirxandin.

## ENCAM

Ji vê vekolînê bi awayekî aşkera derdikeve meydanê ku *Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî ji alîyê qewareya xwe û hêmanên dî yên avahîya derekî ve mesnewîyeke xweser a edebîyata Kurdî ya klasîk e û Şoşî jî mesnewînûsekî girîng ê vê edebîyatê ye. Çawa ku tê zanîn, mesnewînûsîya mijarên dirêj û tehkîyeyî qadeke girîng û serbixwe a edebîyata klasîk a Îslamî ye û mesnewîyên Firdewsî û Mewlana bi qewareyên xwe yên bilind serkêşîya vê qadê dikin. Dema mirov li tarîxa mesnewînûsîya Kurdî dinêre tê dîtin ku di serdema mîrektîyên Kurdan de bi qewareyên navîn tibabek mesnewî hatine nivîsîn. Lêbelê li gor daneyên li ber destan, ji bo ku mesnewînûsîya Kurdî bigihîje qewareyeke bilind divê mirov li hêvîya sedsala XXem bimîne. Lewra *Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî, ku teqrîbî bi 14.000 beytan ji alîyê qewareyê ve mesnewîya herî dirêj a edebîyata Kurdî ye di vê sedsalê de hatîye nivîsîn.

Guman tuneye ku nivîsîna *Gulzar*ê di tarîxa mesnewînûsîya Kurdî de rûdaneke mezin e. Dema mirov qewareyên *Gulzar*ê û pêşîneyên wê yên wek *Mem û Zîn*a Xanî û mewlûdnameya Bateyî dide ber hev û dibîne ku *Gulzar* 5 caran ji *Mem û Zîn*a Xanî û 25 caran ji mewlûdnameya Bateyî mezintir e ev yek baştir tê dîtin. Bêguman girîngî û rolên pêşîneyên *Gulzar*ê qet ne cihê nîqaşê ne, lêbelê hêz û şîyana Şêx Tahirê Şoşî ku di ziman, huner û sîstema mesnewîyeke weha de xwe nîşan daye cihê teqdîrê ye. Eger Şoşî ewqasî zû wefat nekiriba û plana wî ya ku ji bo *Gulzar*ê xêz kiribû bigiha serî tiştekî siruştî bû ku îro edebîyata Kurdî bi mesnewîyeke cîhanî ya ku ji 20.000 hezar beytan pêk tê şanazî bikira.

*Gulzar* herçiqas ji alîyê cureya xwe ve sîyereke menzûm e jî, ji ber ku bi taybetî beşa sereke bi dirêjahî hatiye nivîsîn gelek mijarên wê yên wek mi‘rac, şemail û pendnameyê wek cureyên edebî yên navxweyî û di heman demê de wek berhemên serbixwe dikarin bên qebûlkirin. Dîbaceya *Gulzar*ê jî ji alîyê mijar û cureyên

[56] Ji bo zanyarîyên berfireh bnr. Adak, *Teşeyên Nezmê*, r. 267-321.

edebî yên nû ve gelekî xweser e û li gor daneyên li ber destan digel *Mem û Zîn*a Xanî û *Rewdu'n-Ne'îm*a Rûhî yek ji sê dîbaceyên herî girîng a edebîyata Kurmancî ye.

Xweserîyeke *Gulzar*ê jî ew e ku li gor şêwaza vekolînên zanistî hatîye nivîsîn. Ji ber ku muellif alimekî medreseyê ye ji jêderên tarîxî û dînî yên bi zimanê Erebî sûd wergirtiye û çawa ku rêbazeke bingehîn a vekolînên zanistî ye çavkanîyên xwe di dîbaceyê de dane nasandin û di nav berhemê de jî bi kar anîne. Bi vê yekê ve girêdayî beşên amanc, girîngî û çavkanîyê yên dîbaceyê di mesabeya beşa metodolojîyê ya vekolînên zanistî de ye. Tertiba berhemê ya li ser dîbace, mijara sereke û xatîmeyê û bi taybetî jî senifandina mijara sereke ya li ser beşên mezin yên ku di nav xwe de li ser binbeşan tên dabeşkirin jî encama vê şêwazê ye. Pir aşkera ye ku *Gulzar* ji alîyê Şoşî ve wek berhemeke zanistî ya mufredata medreseyê hatîye tesewirkirin û ji bo armancên pedagojîk bi şêwazeke edebî hatiye nivîsîn. Ji vî alîyî ve *Gulzar* dibe mesnewîyeke dîdaktîk a tarîxî ku nimûneyên wê di edebîyata cîhanê de tên dîtin. Lêbelê di heman demê de wek kesayetekî ku ji nexweşîyê muzderib rengvedana alîyê derûnî yê nivîskar jî li gelek cihên mesnewîyê tê çavdêrîkirin ku ev jî alîyê lîrîk ê mesnewîyê destnîşan dike.

*Gulzar*a Şoşî namzed e ku bibe qadeke serbixwe a vekolînên edebîyata Kurdî ya klasîk. Hebûna nusxeya muellif a orjînal gelekî girîng e. Bi taybetî jî xweşnûsîya muellif û rêbaza ku di destpêka berhemê de di biwara îmlaya erûz û gramerê de hatîye destnîşankirin nirxê berhemê hêj zêdetir dikin. *Gulzar* heta niha carekê li Başûr hatîye çapkirin. Lêbelê li Bakur jî pêdivîyeke mezin bo neşreke rexneyî (edîsyon krîtîk) ya *Gulzar*ê heye. Guman tuneye ku piştî vê çi tewsîfî, çi rexneyî, çi berawirdî li ser *Gulzar*ê dê gelek xebat bên kirin. Disa ji ber ku ji alîyê hunera xweşnûsîyê ve nirxê wê bilind e hêja ye ku çapa wê ya faksîmîle jî bê kirin.

Di dawîya vê gotarê de em dixwazin mijara temamkirina beşên kêm ên *Gulzar*ê jî bînin rojevê. Çawa ku tê zanîn di cîhanên zanist û edebîyatê de metnên ku kêm mane û piştre ji alîyê nivîskarên dî ve hatine temamkirin gelek in. Em di wê bawerîyê de ne ku *Gulzar* jî wek projeyeke mezin a netemamkirî li hêvîya temamkerê xwe ye. Eger ev kar bê kirin hem mirada muellifê *Gulzar*ê Şêx Tahirê Şoşî dê bê cih hem jî wek mesnewîyeke sembol a edebîyata Kurdî navê *Gulzar*ê dê bi herfên zêrîn mayende bimîne. Di roja me de li nav Kurdan alimên ku bi nezm û helbesta klasîk re mijûl dibin her dimînin û belkî jî ev karê ku zehmet dixuye tenê li hêvîya beyana îradeyekê be.

## ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk,* Nûbihar, İstanbul, 2014.

Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdi ya Klasik de*, Nûbihar, İst. 2019.

Akalın, Nazir, "Nizami-yi Gencevi ile Fuzuli-yi Bağdadi'nin Leyli u Mecnun Mesnevilerinin Tartışmalı Mukayesesi" *Türkiyat Araştırmaları Dergisi*, j.3, Konya 1997, r. 201-217.

Akyol, İbrahim, "Nevâî ile Fuzûlî'nin Leylâ ve Mecnûn Mesnevilerinin Yapı ve Konu Bakımından Karşılaştırılması", *Dil ve Edebiyat Araştırmaları (DEA)*, sal: 2019, j. 20, r. 267-293.

Aqtepî, Şêx Ebdurehman, *Rewdu'n-Ne'îm*, (amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, Spîrêz, Dihok 2011.

Can, Şêx Mihemed, *Leyl û Mecnûn* (Wergêr ji tîpên Erebî: Zeynelabidîn Zinar), Pencînar, Stockholm 1992, r. 13-29.

Çemenara, Behrûz "Deramedî ber Edebî Hemasî û Pehlewanîyê Kurdî ba Tekye ber Şahnameê Kurdî", *Custarhayê Edebî Mecelleê 'Ilmî Pejûheşî*, s. 1390, j. 172, r. 119-148.

Çetin, Nihad M., *Eski Arap Şiiri*, çapa duyem, Kapı Yay. İst. 2011.

Doskî, Tehsîn Îbrahîm, *el-Medxel li Diraseti'l-Edebi'l-Kurdî*, Cem'iyetu 'Ulemaî Kurdistan, Dihok 1993.

Doskî, Tehsîn Îbrahîm, "Eş-Şeyx Tahir eş-Şûşî: Muheqqîqen li Dîwan eş-Şeyx el-Cezerî", Kovara *Metîn*, sal: 2000, r. 140-145.

Doskî, Tehsîn Îbrahîm, "Şex Tahire Şoşî û Gulzara Wî", *Kovara Nûbiharê*, sal: 2010, hejmar 112.

es-Si'irdî, Mela Xelîl, *Nehcu'l-Enam*, şerha Ehmed Hilmî Qoxî, Dîyarbekir 1984.

Fesaî, Mensûr Restgar, *Enwa'ê Şi'rê Farisî*, Şîraz 1373.

Gerdî, Ezîz, *Serwa*, Aras, Hewlêr 1999.

Herdî, Ehmed, *el-Erûz fî'ş-Şi'ri'l-Kurdî, el-Mecme'u'l-'Ilmî el-Kurdistanî, Erbîl 2004.*

Hîzanî, Selîmîyê, *Yûsif û Zuleyxa*, amd. Ayhan Geverî, çapa yekê, Nûbihar, İst. 2013.

Okay, M. Orhan, *Poetika Dersleri*, Dergah, İst. 2011.

Selefî, Hemdî Ebdulmecîd & Doskî, Tehsîn Îbrahîm, *Iqdu'l-Ciman fî Teracimî 'Ulema we Udeba el-Kurd we'l-Mensûbîne îla Qura we Mudun Kurdistan*, Mektebetu'l-Esaletî we't-Turas, 2008, berg: 3, r. 1167-1168.

Şake, Bender 'Elî Ekber, *el-Muessir el-Erebî we'l-Farisî ve't-Turkî fî Şi'r el-Xezel el-Kurdî el-Klasîkî*, Muesset Hemdî li't-Tiba'e we'n-Neşr, b.c., 2010

Şoşî, Şêx Tahir, *Gulzar*, ber. Hemze Tahir Şoşî, Êkîtîya Nivîserên Kurd, Dihok 2012.

et-Tebrîzî, Xetîb, Kitabu'l-Kafî fi'l-'Erûz we'l-Qewafî, amd. El-Hessanî Hesen 'Ebdullah, Mektebetu'l-Xancî, Qahire 1994.

Ünver, İsmail, *Ahmedî, Îskender-name İnceleme Tıpkıbasım*, Türk Dil Kurumu Yay., Ankara 1983

Xanî, Ehmed, *Mem û Zîn*, amd. Huseyn Şemrexî, Nûbihar, İst 2009.

Zerîn, Baqir Qurbanî , "Mesnewî: Qalibê Şi'rê Farisî ya Erebî?", *Ayineê Mîras*, sal. 9, j. 49.

Çavkanîyên Dîjîtal:

Ceyhan, Semih "Mesnevî", TDV İslâm Ansiklopedisi, https://islamansiklopedisi.org.tr/mesnevi-mevlana (05.01.2021).

Çiçekler, Mustafa, "Mesnevi" TDV İslâm Ansiklopedisi, https://islamansiklopedisi.org.tr/mesnevi#1 (04.01.2021).

Kanar, Mehmet, "Şâhnâme", TDV İslâm Ansiklopedisi, https://islamansiklopedisi.org.tr/sahname#1 (05.01.2021).

Ünver, İsmail, "Mesnevi-Türk Edebiyatı", https://islamansiklopedisi.org.tr/mesnevi#2-turk-edebiyati (04.01.2021).

https://ganjoor.net/ (jêgirtin: 21.11.2018).

Çavkanîya Destnivîs:

Şêx Tahirê Şoşî, *Gulzar*, nusxeya destnivîs, Pirtûkxaneya Taybet a Hemze Tahir Şoşî.




Pêvek 1:

Şêx Tahirê Şoşî (1917-1962)




Pêvek 2:
Bergê *Gulzar*ê (Ji Nusxeya Şoşî ya Destnivîs)



بسم الله الرحمن الرحيم

رب اشرح لي صدري ويسر لي أمري

واحلل عقدة من لساني يفقهوا قولي

المقدمة

وفيها ١٢ أزهار

"١"

الإفتتاح باسم ربي الأعلى الفتاح


(الله) كو چه ناڤكي شرينه   گوتنا وى حياتي جان و ژينه

اي ناڤي [illegible] (رحيم و رحمن)   وى ذكري ته شفاو درمان

(٢)

Pêvek 3:

Destpêka *Gulzar*ê (Ji Nusxeya Şoşî ya Destnivîs)




Pêvek 4:
Xatîmeya Rewdeya Duyem ji *Gulzar*ê (Ji Nusxeya Şoşî ya Destnivîs)